Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 153
20'ê Şibata 2011
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

**Peyamên sersaxî ên Sekreterê Giştî û herweha Deftera Siyasî a PDK Îranê derheq koça dawiya mamosta Şêx Izedîn Husênî**
R: 2

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîn www.kurdistanmedia.com/kurdi

## Kilînton: Ecêb e ku Komara Îslamî dersa demokrasiyê dide xelkê

Hîlarî Kilîntonê di got û bêjekê de ragihand: Ecêb e ku hikûmeta Îranê dersa demokrasiyê dide xelkê din. Hikûmeta Îranê hêmaya rastîn a dizîn û talanbirina armancên înqilabî ên xelkê ji aliyê girûpek pawanxwaz û dîktator e. Kiryarên Komara Îslamî di tepeseriya xelkê de, nîşan dide ku ew çiqas alîgirê reform û azadiyn e! Wê da zanîn ku tu kesê, hogirî û elaqe bi berjeng û mînaka Komara Îslamî di Rojhilata Navîn de nine. Lewma heya cihê ku vedigere ser mafên xelkê û demokrasiyê, bi gotin û kiryarên rejîmê re dijberî heye.

## Ehmedînijad: Obama nizane navê xwe jî binivîse!!

Li gor ragihandina Îlna, Mehmûd Ehmedînijad di Parêzgeha Bûşehrê de bi xistine berbasa vê pirsê ku, gelo Serokkomarê Amerîkayê dixwaze cîhanê birêve bibe? got: Ew heta nikare biçûktirîn hestên xwe ên şexsî kontirol bike. Ew nikare pêşiya pozê xwe jî bibîne. Ez bawerim heta nizane navê xwe jî binivîsîne, vêca çawa dixwaze reforman di cîhanê de bi hizrên xwe ên şeytanî pêk bîne.

# 9 Partî û Saziyên Opozîsyonê Daxwaza Beşdarî Di Xwenîşandanên Seranserî De Dikin

R: 7

## Rêxistina Lêborîna Navnetewî: Hêzên ewlehî berpiryarê mirina du xwendekaran in



Saziya Lêbûrîna Navnetewî bi derkirina daxuyaniyekê tevî weşandina raporekê li ser xwendekarên destbiserkirî, ji hemû endamên xwe daxwaz kir ku bo azadiya xwendekaran ligel desthilatdarên Komara Îslamî pêwendiyan bigrin.

Saziya navbirî herweha îşare bi kuştina du kes ji xwendekarên nerazî bi navê San'i Jale û Mohemed Muxtarî dike ku bi destrêja gulleyên hêzên rejîmê li 14'ê Şibatê de hatibûn kuştin. Desthilatdarên Komara Îslamî girûpek neyasayî bi berpirsê kuştina wan du xwendekaran tometbar dike û ewa jî rê ji bo derkirina hukmên îdamê bo hin ji neraziyan bi hêceta desthebûn di kuştina wan du kesan de xweş dike. Komara Îslamî paşan gelek bêşermane tometa besîcîbûnê ji wan xist û ew li bi detê alîgirên xwe teslîmê axê kirin. Eve jî li halekê de ye ku malbata San'i Jale ew tometa rejîmê red kirin û paşan jî çend kes ji wê malbatê hatin girtin.

## Sînator Can Mekkin xwazyarê guherîna rejîma Îranê ye



Can Makkin, Sînatorê Komarîxwaz yê Amerîkayê, di got û bêjekê de ligel Dengê Amerîkayê ragihand ku rejîma Îranê tepeserkar û bêrehm e, û torên civakî weke Twîtêr, îmkana xwe rêxistina çalakiyan dide û di encam de wan bo guherîna rejîma Îranê serdixe.

Mekin got: DYA piştevaniyê ji neraziyan dike û Obama jî bi sedema hewl bo got û bêjan ligel Komara Îslamî de rexne kir.

Obama di heftiya derbasbûyî de, derbarê Îran û welatên din ên deverê ku nerazîtî têde çêbûne got: Amerîka nikare rê û cihan di wan welatan de diyarî bike ku çi bihê biqewime yan rû bide. Lê navbirî zêde kir ku dewleta wî piştevanê menewî bo wan kesan e ku xwazyarê jiyanek baştir in nîşan.

## Daxuyaniya Partiya Demokrat a Kudistana Îranê bi hinceta....

Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kudistana Îranê, hilbijartiyê kongireya çardehem, deyemîn pilinoma xwe... Rûpel : 3

## Guhertinên Turkiyê û hilbijartina pêşber



Rostem Cehangîrî

Li ser van guhertinên ku di vê dawiyê li Turkiyê de derketine holê, hin bîr û hizrên nû derketine qada siyasî ya wî welatî. Aliyên siyasî ên weke CHP û MHP... Rûpel: 4

## 32 saliya rojbûna hovekê



Senar Hatemî

Xelkê zulmlêkirî û gelên mafxwarî yên Îranê, 32 salan berî niha li dijî zulm û zor,... Rûpel: 7

## Parastina çavkaniyên siruştî, garantiya Jiyanek ..



Sefye Xalidî

Îro çavkaniyên siruştî û jîngeh, pirsên girîng di .... Rûpel: 9

## Banka Rifah a Komara Îslamî çû nav lîsteya tehrîman de R:5




## Bona pêşgirtin ji daxwaza penaberiya werzişkaran, seferên werzişî hatin rawestandin R:9



# Peyama sersaxî a Sekreterê Giştî yê PDK Îranê bi boneya koça dawî a mamosta Şêx Izedîn Husênî



Em hatin haydar kirin ku mamostayê xebatkar û têkoşerê kevnar yê riya Kurdayetî û olî, mixabin di dawîn çirkeyên roja Pêncşemî, 10'ê Şibatê koça dawiyê kir û dilê tejî ji evîna azadî û rizgariya netewa wî ji lêdanê ket. Wexera xwedêjêrazî, bêguman xesarek berbiçav bû bi taybetî di rêza hejmara wan mamostayên olî ên niştimanperwer ku li dîtingeha ola pîroz a Îslamê ve rizgariya Kurd û gihîştina vê netewa mafxwaz bi azadî û rizgarî bo civatên xelkê rohn kirye.

Bi wê hegerê ez serxweşiya xwe ji civata melayên olî ên xebatkar ên Kurdperwer ku bi xweşî ve di Kurdistanê de hejmara wan zaf in, endamên birêz ên malbata mamosta, hemû dost û alîgirên bîr û hizrên wî birêzî dikim.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**11'ê Şibata2011'an**
**22'ê Rêbendana 1389'an**

## Sergotar

### Ew guhên ku nabihîzin

**Kerîm Perwîzî**

Carek din hejmarek berbiçav ji xelkê, şeqam û kolanên Tehran û Îsfehanê kirine qadên şer li gel stemkarî û milhuriyê li pêxema azadiyê.

Roja duşemî, 25'ê Rêbendanê, herçiqas ku Mûsewî û Kerûbî daxwaza wan eve bû ku xelik piştewaniyê ji serhildana xelkê Misr û Tûnisê bikin û daxwazkarê vegeriyana bo serdemê zêrîn yê Komara Îslamî bin, lê xelik li wê rojê de bi hezaran derketine ser şeqaman û ne ji gef û çavsoriyên Xamineyî û taqm û kopalbidestên wî tirsiyan û ne jî li çarçoveya hizrîna Mûsewî û Kerûbî de man. Wan durûşmên dijî rejîmê û desthilata Wîlayeta Feqîh diqîrandin û mirin ji bo rêberê rejîmê dihinartin û wêneyê Xumênî û Xamineyî şewitandin. Ya ku Komara Îslamî bi serkut, tund û tûjî, îşkence û azaran ve bi taybet li vê yeksal û yekmeha dawîn de zor zêdetir kiribû, lê dîsan jî her xelkek zaf têne ser şeqaman û netirsane durûşmên dijî rejîmê diqîrînin, cihê rêz û pêzanînê ye li hember îrade û morala xelkê, herweha û peyamek rohn e bo dîktatoriya Wîlayeta Feqîh ku jêre dibêje taze tu alavek bo domandina desthilatê li destê te de nemaye û îro û sibê dibe her biçî.

Ji aliyek din ve peyamek rohn û eşkere ye bo hemû wan kesan ku li çarçoveya sîstema Komara Îslamî de difikirin û li hizra reforman li nav rejîmê de ne ku ev rejîmê reform hilgir nine û xelik gihîştine vê baweriyê ku netirsane û bi eşkere têne ser şeqaman û li dijî rejîm, sîstem û rêber durûşman didin. Ger we jî heya niha dengê xelkê nebihîstiye, divêt niha şûn de wî dengî bibihîzin, nexa xelik zaf ji we pêştir e û dê we bi Wîlayeta Feqîh re bi cih bihêle. Li gel hemû biwêrî, qehremanetî û moralbilindiya xwenîşanderan û ew kesên ku li bajarên Îranê li wê rojê de daketine ser şeqaman û li dijî dîktator durûşm qîrandin, biwêrî û îradeya wan cihê rêz û hurmetê ye, lê hinek giriftên kevin û xalên lawaz jî tên dîtin ku mêjdeme mane û nehatine çareserkirin û divêt li pêşerojê de gav bo çareserkirina wan bên avêtin, nexa sitemek e ku ji xelkê tê kirin û têçûyek zor e ku bi xelkê tê dayîn û encamek wusa jî nabe. Vê carê jî weke her car nîşan da ku xwenîşandan, serhildan û tevger bi bê rêxistin û organîzekirin û herweha bi bê rêberiyek jêhatî, azad û demokrat û ji hemûyan girîngtir bi bê bernameyek rohn û cihê pesendê bo pêşerojê, ser nakewe û hêz û enerjiya xelkê jî tê xesarkirin. Rêxistin û organîzekirin bona wê ku hêz belav nebin, hewce ye û ji bo qonaxên dahatiyê bihên rêxistin û rêberiya jêhatî û azad hewce ye bona wê ku xelik li vê qunaxê de bo qonaxek din bihên veguhastin û wan rênimayî bike, nek wekî Mûsewî û Kerûbî bo derbasbûyî û serdemê zêrîn yê Xumênî rênimayî bike. Ji hemûyan girîngtir, hebûna bernamyek rohn bo pêşerojê ye ku piştî nemana vê dîktatoriyê, divêt çi bihê kirin û bas ji çi şêwe jiyanekê bo xelkê tê kirin? Ger ne rêxistin hebe û ne jî rêberiyek berpirs û lêbraw, ne jî bernamyek rohn bo pêşerojê ku hemû kesek xwe têde bibîne, weke niha dê lê bê û ji bilî Tehran û Îsfehanê nebe, ne li Sine û ne li Tewrêz, Xuremabad, Zahidan, Ehwaz û Turkmen Sehrayê tu xwenîşandan û serhildanek nabe.

# Peyama Deftera Siyasî a PDK Îranê bi boneya koça dawî a mamosta Şêx Îzedîn Husêynî

Mixabin em hatin agehdarkirin ku şeva Pêncşemî li ser Înê, bervar10'ê Şibatê, mamosta Şêx Izedîn Husênî kesatiyê olî û siyasî yê naskirye Kurd, piştî heyamek nesaxiyê, di temenê 89 saliyê de li welatê Swêdê koça dawiyê kir û xem û kovana jidestçûnê ji bo xizm, dost û nizîkên xwe bi cih hişt.

Mamosta Şêx Izedîn ji wan kesatiyên naskirî û xebatkarên netewa Kurd li Kurdistana Îranê bû ku temenê xwe bo kar û barên olî û di heman dem de jî xizmetkirin bi armancên gelê Kurd û azad kirina netewa kurd terxan kir û di encam de her bi vê hêviyê û dûr ji niştiman û xelkê Kurdistanê serê xwe danî û çû ber dilovaniya Xudê.

Mamosta Şêx Izedîn kurê Şêx Salih li malbata Berzenciyan bû ku sala 1300' a Rojî li bajarê Banê ji dayîk bûye, temenê nûgihayî û ciwaniya xwe bi xwandina waneyên olî derbas kir û sala 1321'a Rojî li devera Mukriyanê li bajarê Bokanê akincî bû, her li wir jî tevî seha netewî re aşina dibe. Sala 1332'a Rojî bi pêwendîgirtin bi Komeleya Jiyanewe a Kurd ve şanaziya endametiya wê saziyê pêhat dayîn.

Mamosta Şêx Izedîn ji wan mamostayên olî û niştimanpewer bû ku di bizava Dr.Musediq û bizava cotkarî a devera Mukriyanê li dijî tepeserkirina zehmetkêşên deverê helwest girt û piştevaniya xwe bi eşkere ji wan re da eyanê. Li sala 1337'a Rojî li debistana Zanista Olî a Mehabadê erkê wanegotinê girt stûyê xwe û bi wê riyê ve xizmetên xwe domandin. Li salên 1346-1347'ên Rojî, pêwendî bi Partiya Demokrat a Kurdistanê ve girt û kora wanegotinê kir e mekoya hejmarek ji kurdpeweran.

Sala 1357'a Rojî di serhildana gelên Îranê û Kurdistanê de, rolek çeleng di Kurdistanê de lîst. Piştî serkevtina şoreşê weke yekemîn serokê bajêrvaniya Mehabadê hat diyarîkirin. Piştre wekî serokê heyeta nûneratiya Kurd bo got û bêjan tevî heyeta rejîma taze bi desthilatgihîştî a Komara Îslamî rol dît. Piştî êrîşa nîzamî a Komara Îslamî bo ser Kurdistanê, mamosta bajar bi cih hişt û heyamê çend salan li çiya û gundan de erkê xebatgêriya xwe bi cih anî. Di encam de weke penaber li welatê Swêdê akincî bû. Di hemû wî heyamî de jî li xebatê nesekinî û pêwendiyên qahîm ligel hêzên siyasî ên Kurdistanê de hebû û li her boneyekê de hizr û nêrînên kurdpewerane ên xwe nîşan didan.

Koça dawî a mamosta Şêx Izedîn Husênî, bêguman xesarek bû bo bizava rizgarîxwazane a Kurd û ji destçûna wî bo hemû aliyekê cihê xem û kovanê.

Deftera Siyasî a PDK Îranê, ligel nîşandana xem û kesera xwe bo ji destçûna wî xebatkarî û dostê nizîk yê PDK Îranê, sersaxiyê ji malbata xwedêjêrazî û hemû xizm, dost, nasyar û hemî xelkê Kurdistanê dike û xwe di wê xemê de bi şirîk dizane.

Riha wî bi bidesthatina hêviyên wî şa be.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**11'ê Şibata 2011'an**
**22'ê Rêbendana 1389'an**

# Misrê rezamendiya xwe li ser derbasbûna gemiyên şer ên rejîma Îranê ji kanala Soêzê nîşan da

Li gor nûçegihaniya Firansayê, rejîma Tehranê dixwaze du gemiyên şer ên xwe ji kanala Soêzê ve bo behra Midîteranê derbas bike.

Dewleta Îsraîlê jî bi nîşandana nîgeraniya xwe, ew kiryara rejîmê bi gefek li ser xwe û herweha bi siyaseta azirandinê dizane.

Wezareta Derve ya Îsraîlê ragihandiye ku civaka cîhanî gerek bizane ku em nikarin li hember wê kiryarê bêdeng bimînin.

Piştî şoreşa 1979'a Zayînî li Îranê de eva cara yekemîn e ku rejîma Îranê daxwaza îcazenameyê bo derbasbûna gemiyên şer ên ên xwe ji kanala Soêzê dike. Amerîkayê jî ragihand ku dê wan gemiyan bixe bin çawan.

# Daxuyaniya Partiya Demokrat a Kudistana Îranê bi hinceta bidawîhatina Pilînoma deyem

Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kudistana Îranê, hilbijartiyê kongireya çardehem, dehemîn Pilînoma xwe demjimêr 9'ê sibêdeya roja Sêşem,19'ê Rêbendana 1389'an, hevberî 8'ê Şibata 2011'an bi beşdariya endamên eslî û cihgirên Komîteya Navendî û rawêjkara Komîteya Navendî û nûnera Komîteya Karûbarên Derveyî welat dest bi karê xwe kir û piştî du roj karên berdewam û beşdariya çalakane ya beşdarên pilînomê di bas û mijaran de, êvariya roja Çarşemî, 09.02.2011'an dawî bi karê xwe anî.

Destpêka karê pilînomê bi bixêrhatinkirina ji hevalên rêberî û xistine ber basa destûrkara pilînomê bo ber ra û boçûna beşdaran û di encam de pesendkirina wê, ji aliyê Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ ve destpêkir.

Paşan Sekreterê Giştî yê Partiyê, deqiqeyek bêdengî bo rêzgirtin ji canê pak ê şehîdên Kurdistanê, nemaze ew ciwanên azadîxwaz ku bêrehmane di heyamê navbera her du pilînomên vê dawiyê ji aliyê rejîma dîktator a Komara Îslamî ya Îranê ve hatine şehîdkirin û canê xwe di pêxema mafên berheq ên gelê xwe de pêşkeşî azadiyê kirine, ragihand. Piştre yekemîn beşa karê pilînomê ku pêkhatibû ji raporek siyasî ya giştî li ser bûyerên girîng ên siyasî û pêwendîdar bi rewşa siyasî ya Rojhilata Navîn, Îran û Kurd, ji beşdarên pilînomê re hat pêşkêşkirin. Di rapora siyasî ya rêzdar Sekretetê Giştî yê Partiyê de pirsa xelkê Başûrê Sûdanê ku mêj dem e ji bo bidestxistina mafê diyarîkirina çarenivîs û rizgarbûna ji zulm û zordariya dewleta dîktator a navendî ya Sûdanê di xebat û tekoşînê de ne, li dawiyê de gihîştne vê encamê ku di çarçoveya dewleta Sûdanê de nikarin jiyana xwe ya siyasî bidomînin. Piştî hewlek siyasî di asta navxweyî û navnetewî de, di piroseyek demokratîk de ku encama wê beşdariya xelkê Başûrê Sûdanê bû di refrandomê de ku bi beşdariya çavdêrên navnetewî di meha 1 a 2011'an de birêve çû, bi rêjeyek berçav zêdetir ji %98 ji xelkê dengê erênî dan bo cudabûn ji Sûdanê û avakirina dewletek serbixwe ya xwe û ji zulm û zordariya dewleta Sûdan rizgar bûn. Ev serkevtina gelê Başûrê Sûdanê di destpêka vê sedsalê de, ku di dengdanek berfireh de gihîşte mafê diyarîkirina çarenivîsa xwe, bo gelên Îran û gelê Kurd ezmûnek girîng û binirx e, lewra pilînom ev destkevta mezin a gelê Başûrê Sûdanê bilind dinirxîne û pîrozbahiyê ji wan dike.

Beşek din ji basê, îşare bi siyaseta destavêtinên rejîma Komara Îslamî ya Îranê dike di pirosesa siyasî ya welatê Lubnanê û haydana Hizbulahê bo vekişandin ji dewleta hevpeymanî ya Lubnanê û paşxistina pêvajoya doza terora Refîq Herîrî ku sedema wê vedigera bo encama dadgeha navnetewî ya Lahê derbarê wê bûyerê û eşkerebûna aliyên biryarder ên terorê.

Raporê aliyên cur bi cur yên serhildanên xelkî ên beşek ji welatên Erebî xiste ber bas ku ew serhildan ku bi xwenîşandanên xelkê bêzarbûyî yê Tûnisê ji dest zulm û zordarî, dîktatorî û nebûna nan û azadiyê de dest pêkir û di heyamek kurt de dawî bi desthilata serokkomar Zeynel Abidîn Bin Elî û hikûmeta wî anî, nirxand û serbarê berhevdana aliyên curbicur ên vê serhildanê, îşare bi vê hindê kir ku pêvajoya vê serhildanê ku dijî dîktatorî û binpêkirina mafên mirov û azadiyên xelkê bû, bandorê dê li ser pirosesa demokrasîxwazî a gelên din ên herêmê jî hebe. Her ev bandora jî bû ku welatên din jî bi xwe ve girt û pêla vê nerazîbûn û xwenîşandanê bi awayek berfirehtir gihîşte welatê Misrê. Seba girîngiya pêgeha welatê Misrê li herêmê û rola wê a bibandor di pirosesa siyasî a Ereb û Îsraîlê de, bala hêzên djberî xwe bo aliyê xwe rakişand. Di vê raporê de amaje bi dijkiryarên rejîma Komara Îslamî li hember daxwazên xelkê Misrê û hewildan bo berxwar kirin û bilarêde birina pêvajoya şoreşa mezin a han hatibû kirin.

Partiya Demokrat a Kudistana Îranê serbarê derbirrîna nîgeraniya xwe ji destbiserdagirtina destkevtên demokratîk ên xelkê serhildayî ên herêmê û sepandina zordariyê bo ser xelkê di şêwaza hikûmetek Îslamî ku ezmûna tal a dehan salî a xelkê Îranê ye, gişt daxwazên demokratîk ên xelkê dîktator lêdayî ên herêmê ku bi salan e li jêr zulm û zordariya hikûmetên dîktator û gendel de tên tepserkirin û ji hemû mafên xwe yên berheq bêpar in, bi berheq dizane û piştevaniya xwe ji xebata wan bo rakirina desthilatên paremayê diyar dike. Di hemen dem de jî hêvîdar e ku xelkê hişyar û pêgihştî ên wan welatan bi meşdandina rê û cihên baş û analîzên dirust ên bûyeran û balkişandin bo ser çarenivîsa rewşa xelkê Îranê, bo pêkaîna hikûmetek layîk, gav biavêjin ku encma xebat û gorîdanên han bibe hikûmetek demokratîk bo hemû tex û qatên civakê bi hemû pêkhateyên xwe ên cuda cuda ve. Di beşek din a basên siyasî de, îşare bi rewşa siyasî a Komara Îslamî ya Îranê hat kirin ku di vê heyamê de bê guhdan bi raya giştî û daxwazên kom û civatên mirovhez bo desthilgirtin ji binpêkirina mafê mirovan, di vê heyamê de rêjeya darvekirin û girtinên siyasî zêdetir bûne û hikmên demdirêj bi ser wan de hatiye sepandin ku gellek ji wan ji ciwanên azadîxwaz ên Kurd in. Lê xelkê Kurdistanê serbarê siyasetên han ên dijî gelî ên rejîmê, ji xebat û tekoşînê bo gihîştin bi mafên xwe ên berheq, bi mifahwergirtin ji şêwazên curbicur ên xebatê û bi awayekî îroyîn berdewam in.

Herwiha li doma basê de îşare bi rewşa aloz a aboriya xelkê û bandorên dorpêçên aborî ji aliyê Civata Ewlehiya rêxistina Netewên Yekbûyî û ên din hatibû kirin. Ew dorpêçên aborî bi awayek berbiçav bandorên nerênî li ser şandina petrol û tranzît û alwêrkirina pere û bazirganî û teknîkê daniye, her di vê pêxemê de pirsek din, pirsa rakirina yaraneyan e, ku berçêla civatên xelkê kêm dahat û bêkar girtiye û divêheyama kurt û di destpêka qonaxa yekem de nirxa pêdiviyan ji %30 heta %4o jorde çûye. Serbarê hemû evana, Komara Îslamî ji navxweya desthilatê de tûşî reweşk wusa bûye ku pirsên navxweyî navxweyî ên xwe ji berê eşkeretir nîşan dide û di asta navnetewî de jî seba bersivnedana rejîmê bi daxwazên Civata Ewlehî ya saziya Netewên Yekbûyî derbarê destkişandin ji mehandina Uraniyomê û hewildan bo bidestxistina çeka Etomî û bêencammana gotûbêjên welatên 5+1 li Jinêv û Îstenbolê, herwiha tund û tûjî li hember mafê mirovan, rejîma komara Îslamî ya Îranê zêdetir xistiye perawêzê.

Di beşek din a basê de, bas ji doza Kurd di her yek ji beşên Kurdistanê hat kirin, pilînomê bi berhevdan û nirxandinan, li ser vê baweriyê bû ku pirsa Kurd di asta deverê û di asta navnetewî de girîngiyek zêdetir pê tê dayîn û rola serokatiya siyasî ya kurd li Herêma Kurdistanê de fakterek xwedî bondor bûye derbarê vê pirsê.

Beşek din ji basa pilînomê çavxişkandinek bû bi ser rewşa opozisyona Îran û Kurdistana Îranê. Di vê beşê de pilînomê serbarê tekezkirin li ser siyaseta berê ya hizbê, pêdagirî li ser domandina pêwendiyan ligel hêzên siyasî jî kir.

Di beşek din a basên pilînomê de nûnerê Komîteya Karûbarên Partiyê li derveyî welat, nêrîn û raspardeyên hevalên rêberiya PDKÎ li derveyî welat xiste ber raya pilînomê û piştre Berpirsê Komîsyona Siyasî-Nîzamî rapora kar û tekoşîna teşkîlata eşkere ya partiyê li derveyî welat pêşkeşî pilînomê kir.

Beşa dawîn a karê pilînomê pêkhatibû ji bas û lêkdaneweyan li ser komek bernameyan bo hevahengiya karûbarên mehên pêşîn ên Partiyê. Beşdarên pilînomê bi beşdarîkirina çalakane ya xwe derbarê xistine berbasa her yek ji wan beşan, hêlên giştî ên rapora Sekreterê Giştî bo karûbarên pêşeroja Partiyê pejirandin.

**Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**20'ê Rêbendana 1389 a Rojî**
**9'ê Şibata 2011 a Zayînî**

# Daxuyaniya Deftera Siyasî a PDK Îranê bi hinceta xwenîşandanên 14' ê Şibatê

**Hevwelatiyên xweştevî !**
**Xelkê mafxwaz yên Kurdistanê !**
**Partî û saziyên siyasî !**

Xwenîşandanên roja 14' ê Şibata 2011'an, li Tehran û çend bajarên din ên Îranê, bi mebesta piştevanîkirin ji tevgerên xelkê welatên Tûnis û Misirê, û serkevtina tex û qatên xelikê bi ser rejîmên dîktator, ji aliyê dezgehên tepeserkar ên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve, bi tundî hat tepeserkirin û mîna nerîta herdem a rejîmê, kuştin û birîndarbûna çendîn kes û girtina hejmarek ji xelkê nerazî lê ket.

Di vê pêwendiyê de em bi hewce dizanin ku carek din hemû aliyan ji helwesta xwe a di warê wan xwenîşandanan û kiryarên rejîma Komara Îslamî, agahdar bikin.

Em weke siyaseta hertimî a xwe, piştevaniyê ji daxwaza azadîxwazane ya xelkê Îranê dikin û tawanên Komara Îslamî mehkûm dikin, herweha hevderdî û hevxemiya xwe tevî malbatên şehîdan nîşan didin û hêviya çêbûn û saxlemiyê bo birîndaran dixwazîn, daxwaz ji kor û komelên mirovdost dikin bi hewara destbiserkiriyan re bên û îzin bi rejîma cinayetkar a Komara Îslamî nedin ku wan bikin goriyê siyasetên dijîgelî ên xwe.

Her wek berê me ragihandiye, di wê rejîmê de tu derfetek bo reform û guhertinan ku bi qazancê neteweyên Îranê be, tune ye. Tenê domandina xebatê take rê ye bo roxandina wê rejîma dîktator û serberedayî û pêkanîna sîstemek demokrat û federal. Wê xwenîşandane û dirûşmên xelkê, rastî û dirustiya siyasetên me selimand. Bi liberçavgirtina rewşa siyasiya niha ya welatê me û pêvajoya bûyerên deverê ku armanca wan roxandina rejîmên dîktator û anîneserkar a sîstemek demokratîk e ku hemû pêkhateyên civakê ji xwe bigre.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, carek din piştevaniya xwe ji armanca xwenîşandanên roja 14'ê Şibata îsal û dirûşmên wan ku roxana rejîma dîktator a Wîlayeta Feqîhe radigehîne û gihştin bi armancên hevkarî û hevxebatiya hemû hêzên siyasî û pêkhateyên rêberiyek demokrat û xweragir heya gihîştin bi armancên wê meşê, bi pêwîstiyek dîrokî dizane.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**28'ê Rêbendana 1389'an a Rojî**
**17'ê Şibata 2011'an a Mîladî**

# Guhertinên Turkiyê û hilbijartina pêşber



Rostem Cehangîrî

Li ser van guhertinên ku vê dawiyê li Turkiyê de derketine holê, hin bîr û hizrên nû derketine qada siyasî ya wî welatî. Aliyên siyasî ên weke CHP û MHP û zaf aliyên din ên Turkiyê bûne çend deste yan jî çend bîr û hizrên dijî hev.

Herweha di nav hêzên Kurdî de jî BDP daxwaza xwebirêveberiya demoktatîk bo Kurdakincî dike û hin aliyên din ên Kurdî jî hene ku daxwaza xweseriya Kurdistanê û hin jî daxwza mafê çarenivîsê bi awayê federalî di çarçoveya welatê Turkliyê de dikin.

Lê ji hemûyan balkêştir, bîr û raya partiya desthilatdar a AKP, bi serokatiya Receb Teyîb Erdoxan e ku pêşniyaz û nêrînek nûtir daye eyanê û ragihand ku divêt sîstema siyasî û birêvebirî di Turkiyê de bihê guhertin weke jî sîstema serokatiyê bi awayê Wîlayetên Hevgirtî ên Amerîkayê. Ew jî Parvekirina desthilatê bi ser wilayet û parêzgehan de û hilbijartina wan bi dengê xelkê.

Di berhevdana navbera herdu sîstemên kevn û nû de, bêguman bîrokrya nû dikare Turkiyê ber bi guhertinên mezin ên erênî ve bibe. Bîr û hizra han ji aliyê partiya herî bihêz a Kurd BDP'ê ve pêşwazî jê hat kirin û ragihandin ku ew pêşniyaz ji xweseriya demokratîk baştir e û dengê gel dê baştir bihê berçavgirtin û desthilata birêvebiriya gel êdî tenê li Enqerê de nebe, belkî her wilayetek bi hilbijartina parêzgar û waliyê xwe bi dengê xelkê herêmê dibe û birêveberên deverên xwe hilbijêrin û dikarin him çareseriya pirsgirêkên deverê bikin û him jî xwe li îdareya welat de beşdar bizanin. Bi vî awayî birêveberiyê, her nebe hin ji xwastên gelê Kurd dê bihên çareserkirin. Lê divêt nirxandin û dahûrandinek baş li ser aliyên erênî û nerênî yên wê ji hêla aliyê Kurdî ve bihê kirin û bixin ber raya gel.

Di hemen dem de aliyê nigetîve wê, ewe ku dixwazin pirsa netewî bixin bin bandora wê şêwazê û Kurd weke netwe û Kurdistan jî weke yek parçe nehê hesibandin û bi awayê wîlayetî birêve biçe. Lê pirsa Kurd tenê xwebirêvebirî nine, belkî pirsek netewî û siyasî ye û divêt gorî daxwaza Kurdan were çareserkirin û weke netewe bihên dîtin û xwedî ji çand, ziman, dîrok, xak û herêmên xwe derkevin, wê demê ye ku Kurd hest bi serbestiyê dikin.

Bi baskirin li ser wan pirsan hizra mirovê Kurd û Turk dê bigîje wê astê ku hevdu bipejirînin û ger pêwîst be her yek ji wan du aliyan bixwazin weke gelê başûrê Sûdanê di riya referandoman de xweseriya xwe bi çawdêroya rabigehînin navnetewî.

Diyare baskirina wê meselê carê zû ye jiber ku 80 sal e ku tovê dijberiyê û înkarkirina Kurdan tê çandin û renge carê ew teoriye zû nehê piraktîzekirin. Çunke heya niha jî mixabin parek zaf ji hevwelatiyên Turk li dijî sîstemek han radiwestin. Lê bi raya min şêwaza birêvebiriya wîlayetan dê bikare wan hizran hêdî hêdî kal û kêmreng bike.

Ji aliyekê din ve di navbera aliyên siyasî de jî cudahiyên zaf ên hizrî dijî hevdu hene. MHP weke partiyek Şovenîst û neteweperest l Turkiyê tenê bi ya Turkan dizane û her gavek demokratîk bo çareseriya pirsa Kurd, bi dijî hizra "Ataturkîzm" dihesibîne, lê ew hizr di nav xelkê de, di kêmaniyê de ye û di nav parlemantoyê de jî dengê wan li ser biryaran bandorek wusa nabe.

CHP, piştî Ismet Înono hertim li kêmaniyê de bûye û bandora wan jî li çarçoveyek %20 de ye. Lê li dema derketina biçûktirîn ronahiyê bo çareseriya pirsa Kurd, zû bi xwe dikevin û bi partiyên nejadperest re li dijî hikûmetê hevgav dibin. Lewma ji aliyekê ve xwe bi Sosiyal-Demokrat dizane û ji aliyekê din ve jî xwe bi xwediyê rêbaza Ataturk, bi awayekê jî dixwaze di nêrînên xwe de pirsa Kurd gorî xwe çareser bike û bo midehekê zaf karîn bi vê taktîkê Kurdan bixapînin, dengê wan xwe re bibin. Lê bo carek jî gavek bo çareseriya pirsa Kurd neavîtin.

Derheq Kurd û partiyên siyasî yên Kurd, vê gavê dudestey têde dixuyen. Desteyek ligel Erdoxan ketiye û hin gavên erênî jî li Erdoxan dîtine. Wê yekê jî wa kiriye ku Erdoxan bikare dengên zaf Kurdan bo aliyê xwe rabikêşe. Lê seba qewl û sozên Erdoxan gerek em bimînin û çavnihêriya derbasbûna dem û kiryarên erênî bikin.

Desteya din jî hêzên Kurdî ne ku dîsan mixabin dudesteyî û dijberî di nava wan de hatiye pêş û hêza herî mezin û birêxistin jî PKK ye ku daxwaza çareseriya pirsa Kurd di çarçoveya xwebirêvebiriya demokratîk û azadiya Ebdulla Ocalan, Serokê hebskirî ê xwe dikin lê nekariye ji bilî alîgirên xwe tu aliyek din ji derdora xwe bona yekêtî û yedengiya hêzên Kurd kom bike da ku bi destek tijî biçin hilbijartinê û baraja %10 bişkênin û bi girûpek zor û bihêz ve tevlî Parlemantoya Turkiyê bibin. Lewma eva gefek mezin e li ser yekrêzî û tenahiya Kurdan.

Nexa PKK ê şiyana wê yekê heye ku tex û qatên Kurdan li hev bicivîne û yekdeng li hember rikeberên xwe de bisekinin û daxwazên Kurdan bibin Parlemantoyê û di hikûmetê de jî giraniya xwe hebin. Her vê dudesteyî û pirsgirêkan, asteng xistiye ser riya hêzên Kurdî ku çend daxwazî û çend desteyî çêbe û nekarin bi yekdeng herne nav piroseya hilbijartina îsal "2011'an" li meha Hezîranê.

Wekî diyar Kurd nikarin wê yekîtiyê pêk bînin û barajê bişkênin, lewma di encam de dê dengên Kurdan bi aliyê partiya desthilatdar ve bikevin. Lê li vê navberê de erkê giran jî dikeve ser milê hêz û alî û kesatiyên siyasî ên Kurd bi taybetî PKK ku hêza herî mezin a Kurdan e, pêwîste hin qazanc û berjewendiyên xwe yên partîtî bikin goriyê berjewendiyên giştî û netewî.

PKK bi vê yekê jî ne tenê lawaz nabe belkî dê bihêztir jî bibe ûdi nava xelkê Kurd de bi nifûztir û giraniyek zêdetir hebe û li hember dewleta Turk de jî dê bihêztir be, jiber ku rewşa niha ya Turkiyê û Bakûrê Kurdistanê hewcehî vê hindê ye: çunku pêşiyên Kurdan gotine ku pirsgirêkên mezin bi destên mirovên mezin çareser dibin.

Lewma bila bi yek deng, bi yek reng û yekgirtî ger bo carekê jî be, keniyê bixin ser lêwên Kurdan û dujminan bi helwestek netewî û biwêrane ya xwe xemgîn û perîşan bikin.




## Şandek Encumena Siyasî a Kurdên Sûriyê serdana Deftera Pêwendiyên PDK Îranê li Hewlêrê kir



Şandek bilind a Encomena Siyasî a Kurdên Sûriyê bi serokatiy Dr.Mehmûd Erebo, Serokê dewreyî yê Civata Siyasî, roja Sêşemî, 16'ê Şibatê, serdana binkeya nûneratiya PDK Îranê li Hewlêrê kir û ji aliyê Tahir Mehmûdî, Berpirsê Pêwendiyên partiyê ve bi germî hat pêşwazîkirin.

Di hevdîtina navbera her du aliyan de, dawîn guhartinên siyasî di welatên Erebî û pêlên demokratîzasiyonê di Rojhilata Navîn de hatine berbas û bîr û ra hatin guhertin.

Di hevdîtina han de herweha her du aliyan tekez li ser xurtkirina pêwendiyan bo berbirûbûna bi her guhartinek siyasî û mifhsitandin bi qazanca netewa bindest a Kurd kirin.

Her du alî li ser wê yekê hevra bûn ku her du rejîmên Sûriyê û Îran di her guhertinekê de ku bi armanca demokratîzekirina deverê derkeve holê, şiyana reforman nabin û dê bikevin ber êrîşa xelkên azadîxwaz ên xwe, wek ewa ku di wan dawiyane li welatên Erebî de rû dan.

Hêjayî gotinê ye, Encomena Siyasî a Kurdên Sûriye ji 9 partî û saziyan pêkhatiye.

# Li ber bayê serhildanan



Ebdullah Hicab

Serhildanên ku ev demeke welatên Erebî dihejîne, Rojhilata Navîn ber bi guhertinên bê veger ve dibe. Di gel ku rêjîmên dîktator bi çengurk û didanan berxwedidin, lê zehmete ev erdheja siyasî ku her tê û hêza wê xurttir dibe bi hêsanî aram be. Mumkîne ku pêvajo bi lez nemeşe, dibe ku bi astengiyên cidî re rû bi rû be, renge encam ji niha ve bi tewayî neyên pêşbînî kirin, lê wê erdhejê qelîştek xistiye dîwarê sîstemên dîktatore Rjhilata Navîn.

Her çend navenda erdhejê welatên Ereb e û hê paşhejan karîgeriyek zêde li ser rêjîma Komara Îslamî nekiriye, nîşaneyên hindê hene ku rewşa Xameneyî û wilayeta wî jî êdî ber bi aloziyê ve diçe. Li ber wê yekê ye ku bi eşkere em dibînin li pişt girnijînên xapînoke Xameneyî û hevbîrên wî, gurîzankên bizdiyan ji serhildanên gelan xuya dikin. Lewma rêjîm hevdem bi lotikên şahiyê re, zîtikên kîne jî dawêje. Bi awayekê ku hemû organên serkutker, ji şerûdên Sipahê Pasdaran re bigre heya çeteyên Besîc, ji mekirbaz û durûyên îdeolojîk re bigre heya sîxurên dezgehên zaniyariyê, hemû bi hev re di nava amadebûnê de ne da ku pêşiya serhildana gelên Îranê bigrin. Di gel wê hindê jî hawara azadîxwaziya gelên Îranê roj bi roj pitir bilind dibe.

Lê her bi wî awayî ku pêvajoya azadîxwaziyê bi serkut û çavsoriyê nayê asteng kirin û meşa tevçûna rêjîmên dîktator bi zext û zorê nayê rawestandin, her bi wî rengî jî gehîştina bi rizgariyê bê pilan û amadekarî nayê misoger kirin. Pêvajoya ku niha destpê kiriye, wê dereng an zû bigehe Îranê. Lê ji bo ku di wê pêvajoyê de Kurd nebin qurbanî û bikaribin weke mîmarê qewareya Îrana siberojê rola xwe ya pêşeng bilîzin, pêwîstiya amadekariyan niha pitir ji her demê di rojevê de ye. Çunkû bi bê amadekarî, wê erdheja guhertinan, li ciyê ku derfetan bixuliqîne, bibe guriyek bi tîn ku wê ter u hişk bi hev re bişevitîne.

Pêgava yekê û ya here sereke ji bo wê amadekariyê, destnîşan kirina astengî û metirsiyên rengeyî li ser riya têkoşîna rizgariya neteweyî li Rojhilata Kurdistanê ye. Ji pirsgirêkên navxwe re bigre, heya metirsiya ku ji aliyê tundajoyên hemberî gelê Kurd li ser tevgera neteweiye Kurdistanê ye, pêwîste tevgera Kurd bi her awayî amade be. Eger mirov bi awayek hê vekirîtir bas bike, îro, bi rêjîma deselatdar re, zêhniyetek zêdexwaz û dûr ji eqlaniyetê, tundajoyî û zêdegavî, binajoyî û dijminkariya ku bi taybet beşek ji nasyonalîstên gelên cîran li dijî gelê Kurd dimeşînin, her yek xweserî xwe û hemû bi hev re gefan li Kurdistanê dikin. Di wê rewşê de Kurd bi xwe jî bi hev re netifaqin û ew jî belayek mezine.

Hemû tevgera Kurd li ser wê yekê hevbîre ku astengiya herî mezin ya li ser riya azadiyê, rêjîma Komara Îslamî ye. Ew jî ne ciyê netifaqiyêye ku ew rêjîm wê tenê demekê li ser rê rabe ku hêza guherînê bi awayek hevgirtî di qadê de be. Di serî de jî tevgera Kurdistanê bi xwe dibe amade be. Hevdengiyek jî heye ku amadekariya herî giring ewe ku tevgera Kurd, li gor astengî u pêşhatan pilanek stratêjîk bo pêşerojê amade bike. Pirs ewe ka gelo ji ber çi ew xalên hevbeş nabin bingeha pilatformek hevbeş?

Hem şoreşa 1979 u hem ezmûna Hizba Demokrat bi opozisiyona Îranê re nîşan dide ku li navenda Îranê çi diqewime, kê diçe û kê tê, deselat di destê kê de be û opozisyon çawan tev bigere, aliyek hevbeşe "aliyê din" e tevgera Kurd heye. Ew aliyê hevbeş ji yek zêhniyetê re avê vedixwe ku heya niha jî di çarçoveya têgeh û ramana serdest de dijî. Ramanek ku car bi çavê dijminatiyê, car bi çavê xapandinê, car bi çavê rehmê û car jî bi çavê pirebazdek ji bo gehîştin bi amancên xwe temaşey gelê Kurd dike.

Lê amade nîne wê rastiyê bipejirîne ku nav û nasnameya gelê Kurd ji nav û nasnameya gelê serdest u têgeha sîstema serdest bi tewayî cuda ye.

Heya ku ev zêhniyet serdest be, eger rêjîma niha here jî, an balek di nava rêjîmê de, çi di çarçoveya yasaya giştî de, çi bi derbas kirina çarçoveya ji bo hin guhertinên rûkeş desolate bigre destê xwe, wê ne deriyê demokrasiyê vebe û ne jî rê ji bo çareseriya pirsa Kurd xweş be. Emrazê ku ew zêhniyet li dijî gelê Kurd bi kar tîne, perçe perçebûna tevgera Kurd bi xwe ye. Ev tê wê manayê ku potansiyela xebat û hêza tevgera Kurd, di heman demê de ku şiyana pêşengiyê heye, di dema hesase guherînê de dikare her bi wî rengî bibe paniya Aşîl a xwe.

Her yek ji ta û balên ser bi "alyê din" dikare bi beşek ji tevgera Kurd re bikeve danustanê û bi awayekê bilîze. Di encamê de li ciyê ku hêz û şiyana gelê Kurd di yek çarçoveyê de û ji bo yek armancê bê bi kar anîn, metirsiya hindê heye ku ev hêz li xwe vegere û li hember hev bê bi kar anîn. Perçeperçebûnên wan salên dawî û netifaqiyên navxweye hêz û partiyên siyasî destpêka wê metirsiya mezin e.

Wisan xuya ye ku Rojhilata Navîn a nû, têgehek ku ji sala 2003 u pêve ji aliyê serokê demê yê Amerîka George Bush ve hatibû ragehandin, êdî ne bi riya şer û bi destê hêzên leşkerî, lê ji encama serhildana gelên heremê wê ava bibe. Ji bo ku gelê Kurd ji destkevtên wê pêvajoyê bê par nemîne, pêwîste hêzên beşdar di tevgera Kurdistan de çi qas zûye stratêjiyek hevbeş ya neteweyî dabirêjin. Ji bo Rojhilata Kurdistanê, sîvanek neteweyî bi beşdariya hêzên çalak di tevgera neteweyî de pêwîstiyek henokeiye. Eger wisan nebe, wê bayê guhertinan bahozekê bi rê bixe ku toza wê pêşeroja me jî bixe bin xubarê.



## Banka Rifah a Komara Îslamî çû nav lîsteya tehrîman de

Amerîka banka Rifah a Komara Îslamî xiste nav lîsteya tehrîmên xwe li dijî Komara îslamî de.

Banka Rifah bi berhevkirina îmkanatên malî bo kirîna bi milyonan Dolar mûşek û Tank bi nûneratiya Wezareta Berevaniyê a Komara Îslamî hat tawanbarkirin.

Bi gotina dewleta Amerîkayê, wan kirînan îmkan dane rêberên Komara Îslamî ku Citên şer û jêrderyayî ên Îranê li haletê çalak de rabigrin.

Cihgirê wezareta xezîneya Amerîkayê di warê kar û barên terorîzma malî de got: heya niha 20 bankên dewletî ên Îranê ku di piştevaniya bernameya navikî, mûşekî yan terorîzmê de çalak bûn, di bin tehrîman de ne.

Li gor yasaya tehrîman, tu şirketek dewletî û taybetî ên Amerîkayê îzna wê yekê ninin ligel banka Rifah û bank û navendên malî ên di bin tehrîman de têkiliyên ticarî ên malî bikin.

Yekîtiya Ewropayê jî di meha Şibata sala derbasbûyî de, navê banka Rifah xistibû nav lîsteya navendên tehrîmkirî ên xwe.

## Xwenîşandan li welatên Erebî berdewam in

Di pêvajoya xwenîşandanên dijî desthilatê di welatên Erebî ku li Tûnisê de serhilda û li Misrê ji peşqel avêt, niha pirûşkên wê li welatên din yên dîktatoî ketiye û vê gavê Lîbî, Yemen û Behrîn û Umanê berdewam in û bi dehan kes hatine kuştin û birîndarkirin.

Li welatê Lîbî, roja Pênşemî bi roja tund û tûjiyê hat ragihandin.

Bajarê Bîza li Lîbiyê ku heya niha tucar nerazîtî têde nebûne, roja Pênşemî nêzîk 13 kes ji aliyê hêzên ewlehî ên Lîbiyê ve hatin kuştin.

Hêjayî gotinê ye ku di wan xwenîşandana de, Hilîkupter jî ji aliyê hikûmetê ve hatine bikaranîn. Bi giştî neya niha li Lîbiyê de 84 kes hatine kuştin.

Li Seniaya Yemenê jî goriyên xwenîşandanan zêde dibin. Li gor nûçegihaniya Firansayê, roja Pênşemî di pevçûnên navbera xwenîşanderan û hêzên ewlehiyê de, aliyê kêm 12 kes hatin kuştin.

Rewşa niha ya Behrênê ne normal e û hat û çûn li navbera bajaran de qedexe ye.

Hejmara birîndaran ewqas zaf in ku bankên xwînê di encama nemana xwînê de gaziya xwînê ji xelkê dike. Civaka cîhanî jî tund û tûjiya li wan welatan de mehkûm kir û ji wan welatan xwast ku guh bi xwastên xelkê bidin. Bi tayebt Amerîkayê pêşwazî ji wan guhertinên li deverê de ki û bi qazanca hemû dever û cîhanê da zanîn.

# Ji Tehrîra Misrê heya Azadiya Tehranê!



Şehab xalidî

Piştî vê ku neyarên dewleta Husnî Mubarek karîn bi berxwedaniya xwe ya li ser şeqaman Husnî Mubarek naçar bikin ku dest ji posta serkomariyê berde, li Îranê de jî Musewî û Kerubî bona rêvebirina meşekê li Tehranê de bi armanca piştevanîkirina ji xelkê serhildêr ê Mîsrê daxwaza mucewizê kirin, lê wezareta navxwe a dewleta Ehmedînejad ew daxwaz ret kir. Wezareta navxwe serbarê vê ku îcaze neda, ragihand ku yên bêne ser şeqaman jî, dê bi tundî bêne cezakirin. Ji ber ku ên bêne ser şeqaman, têkder in û dixwazin derbê ji nizamê bixin.

Serbarê wan hemû astengiyan, lê dîsan jî di roja 25'ê Rêbendanê de, bi hezaran kesî rijyane ser şeqaman, û diruşman bi dijî rêberê deshilata Îranê Xamineyî û deshilatdarên din ên riyakar dan, lê di encama vê meşa xelkî û dijkiryara tepeserkarane ya hêzên rejîmê de, 2 kes hatin kuştin, û gellek kes jî hatin girtin û ketin ber lêdan û îşkenceyê.

Vê bûyerê di rojeva cîhanêde cihek taybet girt:

Hêlarî Kilînton wezîra karê derve a Amerîkayê li dijkiryara bi tepeseriya meşa nerazîbûnê a xelkê Îranê got: "Ya ku îro em lê Îranê de gewahyarê wê ne, nîşaneya cesûriya xelkê Îranê û nîşaneya riyakariya rejîma Îranê ye, rejîma Îranê ya ku ji xelkê Mîsrê re dixwaze, divêt ji xelkê xwe re jî bixwaz e. Em hêvî dikin ku neyarên dewleta Îranê, û xelkê cesûr li ser şeqamên bajarên cur bi cur ên Îranê, wan derfetan bi dest bixin ku hemwelatiyam Mîsrî bi dest xistin.

Serokê Komîteya Têkiliyên Derve a Nûnerên Melîsa Amerîkayê ji Partiya Komarîxwaz bi veşandina daxûyaniyekê ji meşa xelkê Îranê piştevanî kir. Di vê daxûyaniyê de tevî ragihandina vê ku pêvajoya tepeseriya xelkê Îranê ji aliyê Komara Îslamiya Îranê ve, ji dema hilbijartina serkomariyê ve tundtir bûye, seba vê ku heya niha Amerîkayê bi awayê eşkere ji xelkê Îranê ji bo azadî û demokrasiyê piştevanî nekiriye, wek şaşiyek mezin bi nav kir û got: "Em êdî nikarin vê şaşiyê ducarî bikin". Navbirî herweha daxwaz kiriye ku tewaya hewla xwe bi kar bînin bona sepandina dorpêçên abûrî bi ser wan berpirsyarên ku li binpêkirina mafê mirovan de dest hebûne.

Wezîrê karê derve yê Brîtanyayê, Vîlyam Hîg jî di vê derheqê de got: "Ehmedî nijad ragihandibû ku xelkê Mîsrê divêt mafê bîr û ra eşkere kirinê derheq kar û barên welatê xwe de hebin. Lewra ez jî daxwazê ji berpirsyarên Îranî dikim bila mafek weha ji hemwelatiyên xwe re jî bi rewa bizanin, û li hemerî meşvanan de tund û tîjiyê bi kar neînin.

Herweha hinek ji rojnameyên pirr tîraj jî bi vî awayî bûyera 25'ê Rêbendanê di nav rûpelên xwe de cih dan:

Gardiyan: "Bi hezaran kesên rexnegir û xebatkar li paytexta Îranê de bi hêzên rejîmê re ketin nava şerekî giran de. Di şer û pevçûnan de kesek hate kuştin û bi deyan kesî jî bi tundî birîndar bûn, û hijmarek zêde ji neraziyan jî hatin destbiser kirin, alîgirên tevgera kesk rijyane ser şeqaman. Polîs û cilk şexsiyan bi gaza rundikîner û batûman îrêş kirin ser wan kesên ku dijî dîktatoriyê diruşm didan".

Fayninşal Taymz: "sedan hezar kes ji neraziyan ketin nav kolanên bajarên cur bi cur ên Îranê û hêzên ewlekariyê jî li hember î wan de tund û tîjî bikar anîn, lewra şer û pevçûn saz bû, eva meşa herî berfireh ji sala borî ve heya niha bû, ku bi armanca piştevanîkirina ji xebata xelkê Afrîqayê dest pêkiribû".

Nîyoyork Taymz: "Hêzên ewlekariyê mala Kerubî yek ji rêberên naskirî ên neraziyan, dorpêç kirine, herweha îzna vê hindê nedan ku kurê wî jî serdana bavê xwe bike. Meşeke berfireh jî li Teharnê de birêve çû û deshilatdariya Îranê dest bi tepeseriya neraziyan kir û hijmarek zaf ji neyaran xiste girtîgehê de.

Helwêst û dijkiryarên navxweyî:

Li navxw a Îranê de jî seyîd Ehmedê Xatemî endamê Heyeta Serokatiyê a Meclîsa Xibrigan jî got: "Di fiqha Şîî de bo yên ku bi dijî hikumeta îslamî dest bo çekê bibin, cezayê bidarvekirinê berçav hatiye girtin. Herweha Musewî û Kerubî berpirsyar in li kuştina wan du kesan de ku li meşa roja 25'ê de hatin kuştin, dibe hukmê herî giran bo wan bihê derkirin".

Herweha li gorî zanyariyan 233 kes ji nûnerên mclîsê jî bi wajokirina daxûyaniyekê ew meşa 25'ê Rêbendanê şermezar kirin, û daxwaza dadgehîkirina Musewî û Kerûbî kirin.

Televîzyona Îranê jî li dijkiryarek din de, bi dijî reformxwazan û neyarên dewletê hinek dîmen weşandin ku di wan dîmenan de hinek ji nûnerên meclîsê diruşmên wek "Musewî û Kerubî divêt werin darvekirin " û "Mirin bo Xatemî" didan.

Nûçegihaniya Mêhr jî gotinên Muhsin Rezayî yek ji berbijarên posta serkomariya sala 1388'ê bilav kir ku gotibû: "Musewî û Kerubî fêm nakin ku di wan bûyeran de tenê emrazek in di destê Amerîka û xêrnexwazan de û wan bi qazanc û berjewendiya xwe bi kar tînin".

Ehmed Riza Radan cihgirê fermandê hêzên întizamî jî ragihand: "Bangewaza meşê ji aliyê Amerîka, Birîtanya û Îsraîlê ve bi seranên Fitnê pêşniyar hatiye kirin".

Heya çend rojan berî niha ku xelkê Tunis û Mîsrê serî hildabûn, deshiltdarên rejîm Îranê bibûne kesên herî demokrat û azadîxwaz, û kêmtirîn tund û tîjiya ku ji aliyê hêzên Misrî ve heba, şev û rojan di ragihandinên xwe de diweşandin, û Husnî mubarek jî di gel Mihemed Reza Şah didanîne ber hev. Lê em dibînin dema ku xelkê azadîxwaz ê Îranê jî viyan bo azadî û demokrasiyê bêne ser şeqaman, êdî eva hemû bûne tevdanîkar û sîxorê bîhaniyan û kuştin û darvekirin û her cezayek ji wan re rewa hat dîtin.

Gelo rastî rejîma Îranê bi wan siyasetên xwe ên riyakarane wê bikare heya kengê ser deshilatê bimîne?

Bê şik ew gorankariyên ku hinde bilez di herêma Rojhilata Navîn de rû didin, her cure pêşbîniyekê bo şareza û karnasan îza û dijvar dikin, lê ya ku eşkere ye, ev e ku rejîm gellek zehmet e ku bi wan siyasetên xwe ên riyakarane heya heyamek dûr û dirêj li ser deshilatê bimîne, xelkê Tunis û Mîsrê bi berxwedaniya xwe selimandin ku hekî berxwedanî û yekîtî di navbera hêz û aliyên azadîxwaz de hebe, tu hêz û deshilatek pirr çek jî nikare xwe ragire, û daviya temenê dîktatoran nêzîk e.




## Du heyetên Partiya Demokrat a Kurdistana Bakûr û Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê, seredana nûneratiya PDKÎ li hewlêrê kirin



Roja Çarşemî, 17'ê Şibatê, du heyetên hevpar ji Partiya Demokrat a Kurdistana Bakûr bi serokatiya Seyîd Xoce û Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê "Elpartî", bi serokatiya Nûrî Birîmo, serdana Deftera Nûneratî a PDK Îranê li Hewlêrê kirin û ji aliyê heyetek PDK Îranê ve bi serokatiya Tahir Mehmûdî, Endamê Komîteya Navendî ve bi germî hatin pêşwazîkirin.

Her sê partiyan di wê hevdîtine de dan û stansin li ser çend mijarên pêwendîdar bi pirsa Kurd li Kurdistanê û her yek ji wan welatên ku kurd bi ser de hatine parvekirin, kirin û ew guhertinên ku beşek ji welatên Rojhilata Navîn girtiye û pêşveçûna demokrasiyê di deverê de û ji navçûna dîktatoran bi xaleke cihê hêviyê nirxandin.

Nûnerê PDK Îranê li Hewlêrê li gel nîşandana keyfxweşiya xwe ji wê hevdîtinê, cehd li ser pêwendiyên berdewam li navbera hêz û aliyên Kurdistanî kir û siyaset û nêrîna PDKÎ li ser rewşa Îranê û her yek ji parçeyên Kurdistanê bo heyetên mêvan şirove kir.

## 9 partî û saziyên opozîsyonê daxwaza beşdarî di xwenîşandanên seranserî de Kirin

Pîlanên Hikûmetê bo jinavbirina deskevtên serhildana 14'ê şibatê pûç bikin!

Rabûn û serhildana xelkê di roja 14'ê Şibatê (25'ê Rêbendanê), li ser şeqamên Tehranê û bajarên din ên girîge Îranê, stûnên hikûmetê lerizandin. Neraziyan bi wê xwenîşandanê xalek erênî a din di dîroka azadîxwaziya Îranê de tomar kirin û nîşan dan ku her demekê îrade bikin, şiyan û karîna guherîna seqaya siyasî a welat hene.

Rêberên hikûmetê bi afrandina seqaya tirs û wehşetê di yeksala derbasbûyî de, bi girtina çalakên siyasî, derkirina hukmên giran yê girtîgehê û tepeseriyên hovane û birêvebirina îdamên ser şeqaman jêvebûn ku bizava nerazîbûnê xistine arşîva dîrokê de û şeqam ji nerazîtiyên xelkê betal kirine. Meimûrên ewlehî û rêberên hikûmetê wa ji tepeseriya neraziyan û nemana bizava wan erxayîn û xatircem bibûn ku guman dikirin gaziya daxwaza hevgirtinê di nav xelkê de tesîr û dengdaneweyek wusa nabe û dikarin bi aramî û xeyalek asûde, xwenîşandanên roja 25'ê kuntirol û birêveberiya wê bigrin dest.

Nerazîtiyên xelkê li Tehran û hejmarek bajarên mezin û biçûk ên Îranê bi rêberên Komara Îslamî re nîşan da ku serkevtina tepeserkaran bi ser azadiyê de ji xeyalekê pêtir nine û ya ku waqiiyet heye, beşdarî û hebûna xelkê di roja 25'ê Rêbendanê li şeqaman û qîrandina wan dirûşman e ku bi dijî dîktator bilind dibûn.

Hikûmet ji hatina xelkê bo ser şeqaman û ji xesara ku bi wan ket, gelek nerihet û hêrs e. Kûrahiya hêrs û wehşeta wan di dijkiryarên ku di ragihandinên dewletî û xwenîşandanên nimayişî ên wan de ku bi dijî Mûsewî û Kerûbî lidarxistibûn, bi ronî tê xuyakirin. Ger dîktator hinekê rastbîn bibana, ew xwenîşandan bes bû heya têbigîjin ku bi tepeserî û qîrandina dirûşman bo jinavbirina vî û wî kesayetiyê bizavê, nikarin dengê azadîxwazane yê xelkê bitemirîne.

Em alî û sazî bi hêzên azadîxwaz, civat, navend û çalakên siyasî ku di pêvajoya yekêtî û hevpêwendiya ligel xwenîşandanên 25'ê Rêbendanê, betalkirina pîlanên hikûmetê li dijî çalak û kesatiyên naskirî ên bizavê û rakişandina piştewaniya raya giştî a cîhanê bo berevanî ji cihgîrkirina demokrasiyê di Îranê de hewil didin, hevrê û hevxebat in.

Em ji xwenîşandanên ku di vê pêvajoyê de tên rêxistin, piştevaniyê dikin û gaziya hemû Îranî û azadîxwzan bo beşdarîkirin di vê xwenîşandan û meşên nerazîtiyê ku di bajarên girîng ên Ewropa, Amerîka û Austoraliya yê di rojên Înê 29 û Şemî 30' ên Rêbendanê û roja Yekşemî, 19' Şibatê hevdem li Îran û derveyî welat de tên lidarxistin, dikin.

**Yekîtiya Komarîxwazên Îranê**
**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Partiya Demokratîk a Xelkê Îranê**
**Partiya Komele a Kurdistana Îranê**
**Cehbeya Millî a Îranê – Ewropa**
**Saziya Yekîtiya Fîdayî ên Xelkê Îranê**
**Saziya Fîdayî ên Xelkê Îranê "pirranî"**
**Komîteya Hevanengî a Şêwra Demî a Sosyalîstên Çepên Îranê**
**Şêwra Hevahengî a Bizava Komaraîxwazên Demokrat û Laîk ên Îranê**

**Pêncşemî, 17'ê Şibata 2011'an**
**28'ê Rêbendana 1389'a Rojî**

Rojev

# 32 saliya rojbûna hovekê



**Senar Hatemî**
**Swîs**

Xelkê zulmlêkirî û gelên mafxwarî yên Îranê, 32 salan berî niha li dijî zulm û zor, cinayet û hovêtiya sîstema paşatiyê rabûn û şoreşek birê xistin ku li dîroka hevçerx ya Îranê de bêmînak e. Xelkê azadîxwaz, bivir ji reh û rîşalên desthilata paşatiyê xistin û dawî bi jîna wê anîn. Lê mixabin nezanîn ku hov û dêwek gelek xeter û metirsîdartir ji şahê Îranê dê wan bixapîne û xweşiyên serketina şoreşê ji wan tal û li difna wan de derbîne. Derhal Komek melayên xwînmij û çekçekûleyên şevperest dest dan hev û bi navê Komara Îslamî, deskevtên şoreşa gelên Îranê bi talan birin û li midehek gelek kurt de dîsan ewrên reş û tarî û dûrketî ji asîmanê Îranê, vegerandin ser asîmanê welat û zulm û cinayet, hovêtî û bêdadî weke diyarî bi ser xelkê de barandin ku heya niha jî berdewam e.

Karnameya reş a Komara Îslamî li wan 32 salên derbasbûyî de gelek cinayet û trajîdî li xwe de tomar kirine ku xincî şer, kavilkarî, fesad, hejarî, giranî, bêkarî, girtin, serkut, îdam, pêpeskirina maf û azadiyan, talankirina samanên giştî û ewlehîkirina welat û...hwd tiştek din ji xelkê re nebûye. Komara Îslamî li hovêtiyê de, bêrehmê wekî xwe nebûye û nabe jî, li serkut û tepeseriyan de jî bi heman şêwe, li ajotvaniya şemendefira xwe ya girtin, îdam û kuştinê de jî li hemûyan lezgîntir e, li îşkence û destdirêjiya bo ser xelkê de jî hov sifet e, li dujminatiya bi xelkê xwe re bêhempa ye, li teror û terorperweriya xwe de jî yek e, li direv û buxtan û tometan de li pêş e, li rewxistin û tirsandina xelkê de jî dîsan li pêşiya dîktatoran de ye û htd.

Îsal jî 32 saliya jidayîkbûna nemibarek a tarîtiya xwe li halekê de bi cejin digre ku tewaw rûçikek cuda ji salên berê hebû. Ji hêlekê ve bûyer û guhertinên rojhilata navîn û nerazîbûnên serhildayî li dijî dîktatoran ta û lerz xistiye nav dilê bikîn yê wan, ji hêla din ve jî kirîzên navxweyî û ketine canê hev yê karbidetan, şeqara navbera wan firehtir kiriye. Lê bi her hal dîsan jî bi mezaxtina hezîne û têçûyek zor û teblîxatek zaf, hewil da ku alîgirên xwe bikişîne ser şeqaman û ji beşdariya wan bi armanca rewatî û meşrûiyetdan bi xwe û siyasetên xwe mifahê bistîne û bi vê çendê jî sûîstifadeya xwe ya siyasî jê bike. Her çiqas ku li vê derheqê de li roja 22'ê Rêbendanê de gelek kes bi taybetî qutabî û xwendekarên dibistan û qutanxaneyan bi zorî birin ser şeqaman, lê dîsan jî rêjeya beşdaran negihîşt astekê ku kela dilê wan hênik bike û heta beşdariya xelkê bi qasekê kêm bû ku hin ji ajans û nûçegihaniyên rejîmê neçar man ji dîmen û wêneyên salên borî mifahê bistînin, bi vê çendê jî rojbûna wan bûye taltirîn salveger.

Lê nûçeya îstifa û destjikar vekişandina Husnî Mubarek, serokkomarê Misrê bal kişande ser hemû ragihandinan û bû bi mijara sereke ya ragihandinan û tirs û lerz xiste nav dilê zalimên desthilatdar û hêvî û şadî jî xiste nav dilê azadîxwazan û ew neçar kirin li cihê bend û berbenîgotinan bi ser destkevtên bi qewlê xwe – şoreşa Îsalmî- bi xwe bikewin û li navxwe de rê û cihên ewlehî yên tund û qahîmtir bigrin ber xwe û pêşî ji xwenîşandana xelkê li ser daxwaza rêberên tevgera Kesk li 25'ê Rêbendanê de bigrin. Eve bû ku me dît xelkek yekcar zaf û zêde ji hedê çavnihêriya reformxwazên hikûmetî li bajarên cuda cuda de hatine ser şeqaman û bi durûşmên xwe yên radîkal koşka zordariya Îranê lerzandin.

Hewce ye were gotin ku li vê naberê de rêberên Komara Îslamî dersa exlaq û demokrasiyê ji xelkê Misr û Tûnisê re didin, lê bi xwe jî dûr in ji hemû pîvan û pirensîbeke exlaqî, siyasî û demokratîk; ku tund û tûjî û hovêtiya wan li roja 25'rêbendanê de ku bûye sedema şehîdketina du ciwanan û îşkence û girtin û destbiser kirina bi hezaran kesên azadîxwaz, nîşan û berjenga vê rastiyê ye.

Bi giştî rejîma Îranê piştî 32 salan bi ser temenê reş yê xwe de êdî bi rastiyek înkarnekirî ber bi rû ye, ew jî ev e ku dizane êdî dema vê bi ser çûye û dibe bi zûyî bar bike û li qada siyasî, civakî û aborî a Îranê de derkeve, nexa dê bi derdê Mubarek, Bin Elî û dîktatorên din tûş bibe. Lê ewa jî siroşta dîktatoran e ku dengê xelkê nabihîzin û bi zor û serkutê dixwazin desthilata xwe paydar bihêlin, lê êdî dibe bizane ku xebat û berxwedan û îradeya xelkê Îranê eva digihîje encamê. Çunku ger caran gelê kurd bi tenê li refa pêşîn a xebatê de bû, niha hemû gelên Îranê gihîştine vê rastiyê ku êdî reform li çarçoveya vê sîstemê de îmkan tune û take riya gihîştina xelkê bi mafên xwe yên demokratîk, hiloşîna vê rejîmê û avakirina sîstemek demokratîk û federalî li Îranê de ye.



www.agiri.org

# Demokrasî


N : Şehriyar Zerşinas W : Siyamend
Beşa 4

Nêrînek bi ser jiyana siyasî a nîzamên demokratîk vê yekê dide holê ku em nikarin pêwendiya navbera dengder û kiesên hilbijartî bi hilbijartinên giştî û gerî ve girê biden. Eger em mêzeyî rola partî û saziyên siyasî, yekitî û civatên xelkî, bizavên civakî û di peyvekê de jiyana pir ji ewraz û nişîva civaka sivîl di civatgehên demokratîk de biken, aloziya wan pêwendiyane eşkeratir dibe.

Hevwelatiyê civaka demokratîk, ji riya binyatên navbirî ve dikare beşdariyê di jiyana siyasî de bike û li ser biryarên wan bandor dane. Bi wateyeke din rêxistina siyasî, hêzekê dide destê hevwelatî heya bi vê yekê û di cehda hevpara digel hevhizrên xwe de bikare bi ser neşiyanî ên kite kesiye xwe di orta civakî de zal be. Lewra em dikarin Partî û saziyên siyasî wek alava birêvebirina îradeya siyasî a hevwelatî ên civakê bihesibînin. Ew binyatane nûnerê guropên cur bi cur ên civakî ne ku li riya bandorkirin li ser raya giştî û birêvebirina zext û givaşê li ser Hikûmet û Parlimanan, daxwaz û xwasteyên hevwelatiyan tînin ziman. Lewra dibe azadiya çalakiyên Partî û saziyên siyasî weke yek ji pêşmerc û pîvanên nîzamên demokratîk were hesibandin. Pêkanîna hevdengî û aştiyê di navbera hez û daxwazên cur bi cur ên xelik, bi bê beşdariya girûpên siyasî di jiyana civakî de nemimkine. Nîzamek ku cih û warê beşdariya xelkê di avakirina dewleta demokratîk de ji riya hilbijartinên azad pêk tîne, nikare bi awayekî hevdem wan ji destpêragehiştina bi alavên bi bandor bona beşdarî di kar û barên siyasî bêpar bike. karekî han bi tewawî berevajî hev xwe nîşan dide. Lewra helbijartinên azad û azadiya çalakiyên partiyan, hewce û tewawkerên hev in.

Komele, civat û destpêşxerî ên hevwelatî bûne, nûnerên xelkê di şopandina armancên taybetî ne û dikarin wan baskê bişiyanê hevwelatî di tekezkirin li ser daxwaz û xwasteyên xwe û şiyandan bi hevwelatî lihember qasa hêza dewletê berhev bikêşin. Em nikarin tu demokrasiyeke moderin peyda bikin ku têde azadî a Partiyên siyasî wek berjenga birêvebirina îradeya siyasî a guropên cur bi cur ên civakî nehatibe gerentîkirin.

Armanca partiya siyasî, destpêregehiştina bi desthilatê, bo pêşvebirina bernameya xwe di çarçoveya armancekî taybet a siyasî de ye. Bi vî awayî em dikarin şîyana Partiyên siyasî ên pêwedar bi girûpên cur bi cur ên xelkê bihesibînin. Ew Partiyane ji




aliyekê dîtin û nêrînên siyasî û ji aliyek din ve daxwaz û hewcehiyên xelkê xwe kom dikin daku paşan ji riya berêkanî ên siyasî û di dawiyê de bidestanîna desthilatê , wan di binyatên dewletî de cî be cî bikin. Bi bê çalakiyên azad ên partiyan, baskirin ji beşdariya xelkê di kar û barên siyasî de bêwate ye. Civaka Piloral û zêdeyî tenê dikare li hebûna partiyên siyasî, şîyana kiryarên siyasî peyda bike. Tenê ji riya Partiyên siyasî ye ku helbijêrvan wate xelik dikarin îradeya siyasî a xwe bi awayekî rastîn di kursiya desthilatê de cî bi cî bikin. Lewra, Partiyên siyasî xişteya wan hêzan in ku xelik ji aliyê wan ve pêgehên hêzê dagîr dikin heya ji vê riyê ve biryarên siyasî û bername yên xwe cî bi cî bikin.

Her wek amaje pê hat kirin di pirsên diyarîker ên kar û barên siyasî, kiryar hertim di rasteya paşerojê de dimeşin, paşerojek ku hesibandina serrasta tev yasyên wê nemimkine. Herwusa dibe bihê zêdekirin ku di siyasetê de bikêmî dikarin tenê bersivekî rohn û sade bi pirsyarên aloz û dijwar bidin. Ew rastiyane hewcehiya azadî a Partiyan û berêkaniya siyasî navbera wan zeq dikin. Bas û nîqaşên Partiyan li ser bingeha eslên pênasekirî ên berêkaniya hêminane, ne tenê ji bo nîzama demokratîk karekî bi pasaw û berheq nine, belkî herwusa hewce û ne cihê lêderbasbûnê ye.

Demokrasî tenê di cihekê de dimeşe û payedar dimîne ku civaka pirranî û piloral bikare ji riya vêc û hêzên rêxistî, ji biyava siyasî ve bi bandor û çalak bimîne û desthilata xelkê bi hevkariya hêza siyasî û helbijartina karbidestên xwe cî bi cî bike, Partiyên ku bi awayeke azad hatine avakirin û digel pîvanên nîzamên demokratîk hevxwanî hene.

**Opozisiyon an altirnatîva siyasî**

Di kûratiya hizrên pêwendîdar bi darêtina dewleta demokratîk, du bawerî û ceribînên bingehîn, hewcehiya hebûna opozisiyonê wek berjenga cihgirê hikûmetê da selimandin: Yekim ewa ye ku demokrasî, karabûna rastîn a xwe ji bas û nîqaşên siyasî û civakî werdigire û ya duyem jî ewa ye ku dagîrkirina desthilatê, bandorekî gendelkarane heye û dibe ji riya berçavgirtina rêkarên rêk û pêk di zêrevaniya desthilatê ku yek ji wan çalakiya opozîsiyonê wek berjenga baska lihember hêza hikûmetiye – digel wê tirsê berxwedanî kir.

Rayedarên siyasî ên sedsala 17'an yên Ewropa li ser vê baweriyê bûn ku Hikûmet û opozisiyon di nîqaşa navbera hebûn û tunebûna desthilatê li biyavê exlaqî ve jî cuda ne. Tûşbûn bi gendelî zaftir gefê ji wan kesan dixwe ku desthilat di destê wan de heye û opozisiyon hêzeke ku divê digel wê tirsê berxwedaniyê bike. Li riya cihgirkirina opozisiyonê divê azadî were gerentîkirin û ev kare demekê misoger dibe ku sirûşta gendelperwerî a mirov û bitaybet desthilatdaran, bi hevkariya kêşeke siyasî bihê zêrevanîkirin, heya bi vî awayî azadî nebe sedema pêkhatina kedxurî û aloziyan. Li ser vê hitbarê di nîzamekî demokratîk, di kêleka hikûmeta helbijartiya xelike, opozîsiyon duyemîn milê çalakê siyasî tê hisibandin û berahiya vê digre ku digel hêza desthilatdar, esliyeta xwe digel esliyeta dewletê yek bihesibîne û siyasetrêjiyên xwe bi awayeke reha bihitbar rabigihîne. Di rastî de jî di sîstemek Parlimanî de, hêla mewdaya siyasî a navbera hikûmet û parlimanê yan bi wateyeke din dezgeha birêveberî û dezgeha yasadananê nahê kêşandin, belkî ew hêle zaftir di navbera partiyên li hevhatî ji aliyekê û partiyên siyasî ji aliyeke din ve berdewam e. Bi vî awayî di kêleka awayên kilasîk e ji hev cudakirina desthilatê – îro em şahidê ji hev cudakirina dezgehên zindî yên din jî di sîstemek demokratîk de ne.

Helbet nabe imkana zêrevaniya desthilatê ji riya opozisiyonê pirbiha bihê hesibandin. Opozîsiyon bi sedema nebûna pirranî, bikêmî dikare gotina xwe di parlimanê de cî bi cî bike. Lê ewa ku rolê opozîsiyonê di sîstemekî demokratîk de zeq dike, her ew kareye ku ev hêze dikare ji riya rexnekirina kêmasiyan di bîr û raya giştî de encam bide. Ji aliyeke din ve, opozîsiyon ger bixwaze kiryareke rastîn hebe, dibe ji mafên parlimanî û meydanî a berfireh mifah werbigire. Opozîsiyon herwusa di cehdên teblîxî de jî dibe ji şansê wek hev mifah werbigire û ji îmkanat û alavên dewletî û jêderên giştî di piropagendeya bîr û rayên xwe di nava bîr û raya giştî de mifah werbigire. Berçav negirtina wan eslane, opozîsiyona parlimanî wek opozisiyona nizamê dide holê. Opozîsiyona nizamê, bi dijî binyatên yasaya bingehîn dixebite û vê yekê wateyek xincî hiloşandina destpêkerî ên nizama demokratîk nine. Demokrasî nikare bi karekî han re bihevhatî û teba be . Sîstemek ku lihember çalakiyên opozîsiyonê de berbendan pêktîne, jiyana siyasî a civatgehê tûşî qeyran û cih û warên opozîsiyona tûndajo pêk tîne, wate hêzek ku armanca wê êdî ne vêdebirina partî û hêza hikûmetî, belkî ji holê rakirina nizamê ye. Lê demokrasî hilgirê rewşek han e ku guhertina hikûmetê di çarçoveya pêwendiyên heyî de pêk tîne.

Demokrasiyê pêdivî bi opozisiyona Yasayî di hundir û derveyî parlimanê de heye, hêzek ku hebûna wê, pîvanek ji bo azadî û hêsankirina nizameke siyasî ye. Tenê di çarçoveya pir kêşeya bihevresazîn û berêkaniya navbera hikûmet û opozîsiyonê ye ku siyaseta demokratîk geşe dike. Opozîsiyonê ne tenê pêdivî bi bivêrî û hêza xiyalî, belkî herwusa hewcehî bi rewşekî civakî heye ku nîqaş û berêkaniya siyasî mandel neke. Rewş û fezaya ku hikûmetê bi sedema desthilateke direwîn û kazib, neke xwediyê pêgeha xasmanî û her cure rexneyekê wek dujminayetî û xirabkarî ji qelem nede. Demokrasî hertim pêdivî bi hewayê taze û nû heye. Ew hewayê taze tiştek xincî valahiştina fezaya civakî û pêşkêşkirina durdîtinek kivş û rohn ji bo guhartinan nine. Garantiya çalakiya azad û yasayî a opozîsiyonê di nizamekî siyasî, wateya pêşwazî ji fezayekî han vekirî û dûrdîtina rohn e.

# Parastina çavkaniyên sirûştî, girantiya jiyanek geş




Sefye Xalidî

Îro çavkaniyên siruştî û jîngeh, pirsên girîng di cîhanî de ne.

Gelek ku xwedî çavkaniyên siruştî ên zêde di hêla abûrî de be, civaka wî gelî jî pêşdikeve. Hewildan ji bo parastina çavkaniyên av, xak, giya, dar û ber û çiya û çavkaniyên binerdên welatê me, erkê li ser milê her takek civakê ye.

Ger em bixwazin vê mijarê li ser bajarê Urmiyê bi kurtahî li ber çavan re derbas bikin, dibe bibêjin Urmiye bajareke ku di warê siruştî de xwedî dewlemendiyek mezin e. Lê mixabin em nikarin wê rastiyê jî nebêjin ku ew dewlemendiye ji aliyê dewleta desthilatdar bi ser welatê me ve pirr biçûk tê ditin, ku di gel wê kêmdîtinê jî hewldana ji bo jinavbirina wê jî nerawestaye. Mînakek bercav a wêrankirina sirûşta wê deverê, avbenda Noşanê (Şiher Çayî) ye ku di kêleka gundê Noşanê hatiye avakirin û di sala 1384'a Rojî de karê wê bidawî hat û çêkirina wê avbendê 5 salan dewam kir.

Di dema avakirina wê avbendê de çend kes hatin kuştin, herweha hejmarek mezin ji gundên wê deverê mîna Dolepêsan, Hilorî, Xirê, Mîrewa, Zêrîxan û... Milk û erdê çandinê ên gundên din mina Noşane, Qesig, Selîmbeg, Helefele, Tûyê û Sîlwana dagîr kiriye. Debara jiyana wan gundiyan, li wan erd û milkên çandinê dihat bidestxistin. Lê hikûmeta Komara Îslmî bi pereyek hindik erd ji xelkê stand û ew necar man ku ber bi bajar herin. Piştî heyamek pirr kêm tenê kedkarî û zehmetî di bajar de bû qismetê xelkê wê devera pir bêkar. Erdê bab û kalan bi carekê di avê de çû.



Urmiye bajarek xwedî 5 Milyard (mm) ava ser erd û herweha 2/5 Milyard (mm) ava jêr erdê ye, lê belê ji sedî 80 xelkê Urmiyê bo ava vexarinê, bîran bikar tînin. Herweha avbenda Naziyê (nazlu) ku 273 Miliyon (mm) ava rûbarê naziyê ku di kêleka 145 gundan de derbas dibe, di hundurê xwe de cih dike. Îro ger ku gola Urmiyê kêm dibe û ber bi nemanê ve diçe, bi sedema avakirina wan avbendan e ku rê li ber hatina awê ji bo gola Urmiyê digre. Li herêma bajarê Urmiyê, 16 avbendên mezin û biçûk hatine avakirin. Çêkirina wan avbendan ne tenê alîkar nebûye ji bo parstina avê, belkî bûye sedema bi xesarçûna ava deverê.



Di cihê ku ji bo parastina avê pilanrêjî bihê kirin, mixabin pîlandarêtin tên encamdayîn û li hejmara avbendan tê zedekirin, herweha erdên çandinê, bax û bostanên wan herêman tên jinavbirin, çavkaniyên siruştî û aborî dikuje.

b Di hêlek din di lihevhatinek di navbera Îran û Turkiyê de, sala 1386' a Rojî, derbas bûna boriyên Gazê di nav axa bajarê Urmiyê de bo Turkiyê dîsan erdê çandinî yê gelek gundan mina Mîrawa, Qişlaq, Bendê, Pîrhedî, Şemlekan, Mendedol û .... bûn goriyê wê siyaseta dewletî û êdî xelk nikare li ser wan zeviyan kar bikin.

Belê mirov dikare bêje, ewane dan û standinên navbera dewletan de hewceye hebe. Lê mirov dikare vê yekê jî bibêje ku pirraniya gundên herêma Urmiyê ne tenê bê gaz in, belkî hikûmetê av û elektirîk jî bi awayek pêwîst ji wan re berhev nekiriye.

Li 3000 gundên herêma Urmiyê tenê 112 gundan gaz hene ku ew jî li sedî 70 gaz ji wan tê birrîn.

Herwiha eger em bixwazin bi kurtî li ser çiyayen wê herêmê bibêjin, pirr zozan û seyrangehên xweş û delal mîna Sûle Dûkel li nizîk Dizê ya Mirgewer ku weke yek ji bilindtirîn Feraşinên Îranê jî tê naskirin, tu derfet û îmkanek ji aliyê hikûmetê ve bi xwe ve nedîtiye ku xelk bikare bi hêsanî seredana wê seyrangehê bike.

Gola Marmûşo û Feraşîna Sûlk li devera Tirgewer jî di heman rewşê de ne.

Çiyayê Dalanper li li devera Mirgewer ku bilindahiya wî 3487 metro ye, xwedî xwezayek behempa ye, lê ew jî weke her cihek girîng ên din, tu car ji bo parastina wî hewl nehatiye dayîn.

Tenê kariye li her hêlekê ve ji xwe re parêzgehekî dabinê û her çend mideh carek top û tankên xwe li ser kevir û dar û berên çiyayên me de biceribîne.

Xwezaya Urmiyê di gel gola wê ber bi nemanê ve diçe û roj bi roj xirabtir dibe, mixabin serwet û samana veşartî ya Kurdistanê bi mirinê ve rûbirû ye.

Hêvîdar im ku rojek bihê di serî de desthilat û piştre gel bigîjin vê rastiye ku çiqas perwerdeya zarokan di malbatê de û di civakê de girîng e, ji bo ku jiyanek bextewer bikin, xweza û çavkaniyên siruştî jî ewqas girîng in ji bo ku mirov welatek geş, rengîn û dewlemend hebe û ji bo ku pêşeroja nifşên nû bihê misogerkirin û ev yek bibe kulturek di nava civakê de. Bi hîviya wê rojê.

## Bona pêşgirtin ji daxwaza penaberiya werzişkaran, seferên werzişî hatin rawestandin

Serokê heyeta tekwandoya, Mazenderanê got: bi nedana îzna seferên werzişî bo dervey welat, bi milyonan tûmen ji hezîneyên me heder çû. Me bilît kirîbûn û hotêl bi kirê girtibûn, lê hat ragihandin ku şêvra dervey sînor a saziya werzişî "terbiyet bedenî" bo sefera bo Holendê nerazî ye. Nerazîtiya han di pêvajoya nevegeryana werzişvanan bo welat e ku li welatên rojavayî de dimînin û daxwaza penaberiyê dikin.


Piştî binav hilbijartinên gera 10 a Serokkomariyê, di hemû seferên werzişî bo derveyî welat de bûyera han çêbûye. Tu seferek nebûye ku werzişvanek yan çend ji wan ji tîma xwe cuda nebin û daxwaza peraberiyê nekiribin.

Rewşa niha ya revîn û nevegeryana werzişvanên Îranî, tenê ligel dewrana şerê 8 salî yê Îran û Îraqê de tê berhevdan.

Saziya "terbiyetbedenî" a Komara Îslamî, çareseriya wê rewşê di pêşgiriya ji seferên werzişî bo Ewropa û Amerîka de dibîne.



# Madeyên hişber çekek din a nifşkujiyê



Ceifer Mubeşirniya

Nifşkujiya kêmanî ên netewî, mesebî û hizrên cuda, bîrokeya qirêj ya rejîmên dîktator ên cîhanê ye.

Yek ji wan rejîmên dîktator, Komara Îslamî a Îranê ye ku li asta herî bilinda wê rejîmê de jî, Welî Feqîh ku poanek zêdetir ji her dîktatorek din bi xwe daye – nûnerê xweda li ser erdê- bi tometên cur bi cur ên weke cudaxwazî, muharibe " şer li gel xweda" û ..., neteweyên kêmanî bi taybetî netewa Kurd û kêmaniyên mesebî û cudabîrên Îranî xistine bin givaşan de û bi wan hizrên xwe di wan 32 salên derbasbûyî de bi hemû awayekê hewla jinavbirina kêmaniyên netewî û mesebî herweha cudabîran daye û qonax bi qonax bi çekên serdem ji êrîş bi armanca tunekirina nifşa wan, xwe ji tu hovîtiyekê neparastiye.

Di destpêka bidestvegirtina desthilatê di Îranê de û zalbûn bi ser nemû netewe û kêmaniyên mesebî fikrî, bi giştî hizrîna ne di çarçoveya îdeolojîka Komara Îslamî de, dîrok şahidê sepandina çendîn şerên neadilane, girtin bi tometên cur bi cur, îdam û komkujiyan bi taybetî di Kurdistanê de ji aliyê Komara Îslamî ve ye.

Ew şer û fitne di encama hebûna netewe, meseb û hizrên cuda di welat de bûn û çavên wan pêbaran nedihatin(beredayî nedida) û pexîlî û hovîtiya xwe berdewam kir heya ku partî û saziyên dijberî xwe li sînorên Îranê de derxistin, herweha çalak û mafxwazên dozek rewa li welat de yan girtin û bi hukmên giran hepsî û bidarvekirin, yan jî welat bi wan dan terkkirin.

Ew şîweya dijayetîkirinê yanî roxandina sitûnên bingeha civakek pirrnetewe, meseb û hizran. Jinavbirina wan pêkhateyên civakê bi wateya nifşkujiyê tê.

Pêvajoya han heya du dehsalan ji aliyê Komara Îslamî ve berdewam bû û hin ji wan armancên mirar ên rejîmê bi encam gihîştin. Wate partiyên siyasî ên dijberî rejîmê li welat dûr ketin, çalakiyên berevanî li hember parastina saxlemiya civakê di riya girtin û jinavbirina çalakên wî warî de hatin sekinandin.

Lê civaka Îranê bi giştî û civaka Kurdî bi taybetî, ji armancên xwe ên pêşvebirin û parastina saxlemiya civaka xwe li hember pîlanên nemirovane ên Komara Îslamî xafil nebûn, bi awayek din bi bê bikaranîna tund û tûjiyan çalakiyên xwe berdewam kirin.

Komara Îslamî çalakbûn û saxlemiya civatgehên cur bi cur ên Îranê bi gefek li ser desthilata nerewa ya xwe dizanî û bi wê yekê jî hesiya bû ku ragihandinan cîhan kiriye gundek biçûk û komkujî bi top û teyare û çekên giran li çavê civaka cîhanî wunda namîne û riswayiyek pêtir dê jêre bimîne. Herweha ji bo navbirina neraziyên welat ku pirraniya xelkê ye nikare bi milyonan mirovan bikuje, cora çeka xwe guherand û stratîjiyek din a dujminkarane girte pêşiya xwe bi armanca tunekirina nifşek saxlem û çalak a civaka Îranê û baştirîn metod ji bo wê armanca xwe, belavkirina madeyên hişber dinav ciwanan de destnîşan kir.

Di rastî de, ger mirov bêje di dîroka 32 salî a cinayetên Komara Îslamî de madeyên hişber, çeka herî malwêranker û bikuj bûye ku pêtirîn xesar gihandiye civaka Îranê, ji rastiyek tehl bidûr nine.

Nemana heş û hizrînek dirust bi sedema bikaranîna madeyên hişber ji aliyê ciwanan ve, destpêka rêrewa pisporî û hostayiya bingeha civakek zindî dixe ser hêlên şaş û riya jiyanê ji wan mirovan winda dike.

**Çend mînakek ji xesarên siyaseta nifşkujiya Komara Îslamî ji riya madeyên hişber ve**

Jidestçûna hêza cesteyî û fikrî ya kar û nemana xweseriyê di pêvajoya jiyanê de û pejirandina pêşniyazên nerewa ên her aliyekê ji bo bidestxistina nanê rojane û mesrefa madeyên hişber.

Xemsarî û girîngînedan bi pirsên mezin ên weke netewî, namûsî û pêşveçûna tak û civakê, xafilbûn ji bûyerên girîng ên cîhanî, deverî û ....

Nemana soz û evîn di malbatan de û heya hiloşîna wan.

Zêdebûna liradebider a amara jihevveqetyana jin û mêran.

Bêserperest manewa zarokan û ji destçûna fersendên perwerde û geşekirinê.Ji hemûyan dilgirantir, gorîbûna qata jin di bin bargiraniya erkên malbatê de di encama nebûna serperestek şiyaw di malbatek tûşbûyî bi madeyên hişber.

Gelo pîlanek ku civakekê ber bi vî halî bikşîne û armancên birêveberên wan pîlanan jî roh bin û mîratgirê komkujiyên derbasbûyî bin, ji nifşkujiyê bider dikare çi navek din li ser bihê danîn.



## Helatina 250 hezar pisporên Îranî ji cehenema Komara Îslamî



Rejîma Komara Îslamî a Îranê îtiraf kir ku 250 hezar pisporên Îranî bo welatên Amerîka û Kanadayê reviyan e. Cihgirê Wezîrê Zanistî yê Komara Îslamî, bi amaje bi derketina 250 hezar pisporên Îranî bo Amerîkaya Bakûr, ragihand: sermiyana însanî ji çûna pisporên Îranî bo derve, nêzîk 250 Milyard Dolar e.

Herweha Husên Nadirî got:

Pêtir ji 250 hezar mihendis, pijîşk û pisporên Îranî li Amerîkaya Bakûr dijîn û perwerdekirina her pisporek di Îranê de 1 Milyon Dolar bo welat hezîne heye û çûna 250 hezar pisporan berambe bi 250 Milyar Dolaran e.

## "HIV" hêj li bajarê mesebî yê Qum'ê goriyan distîne




Birêveberê giştî yê saziya saxlemiyê li parêzgeha Qumê, Hacî Ceiferî, got: Heya 8'ê Şibata îsal, navê 522 kesên tûşbûyî bi nesaxiya îdzê hatine tomarkirin ku 45 ji wan jin û 477 jî mêr in.

Li nava nesaxên HIV de ku canê xwe jidest dane, 3 jin û 93 mêr in. Bi giştî 18.4 ji sedî a nesaxên îdzê li parêzgeha Qumê de mirine.

Navhatî heweha bi amaje bi wê ku nesaxiya îdzê heyamekê weşartî derbas dike got: ji 98 nesaxên gîrode bi HIV ê 89 kes mêr û ên din jî jin in.

Hacî Ceiferî daye zanîn ku berê divêt rewşê qebûl bikin û sedemên wê destnîşan û paşan li pey rêkarên parastin û dermana vê nesaxiyê bikewin. Wî herweha veşartina vê nesaxiyê bal hin jinan bi kirîzek mezin da zanîn.

# Daxuyaniya Şivan Perwer



**Daxuyanî:**

Ji raya giştî re, Ji kî û ji kuderê tê bila bê, ji zîhnîyeta bandorvan, hov û çavsor re tu car min serê xwe xwar nekiriye û nakim. Ez duh çava bûm, îro û sibê jî her weke xwe me. Yanî bilindkirina ruhê Kurdistanî, hevîdariya daxwaziya hunerî dijîm,

Hunerê azad û serbixwe hergav nîşana xebat û xizmeta min e. Sebra min geleke, behna min firehe. Hêviya min bilinde, baveriya min xurte, armanca min rojên şad û peşerojek ronake. Lê gelo evên ku dest bi vê kampanyayê kirine kî ne û vana ji min çi divên? Çi dixwazin? Dost ya dijminê gelê me ne? Ji ber ku tiştên di vê kampanyayê de hatine gotin û iddia kirin, hemû derewin.

Hemû hevdîtin û têkiliyên min eşkerene û li pişt diwar û perdan veşartî nemaye.

Me dît ku vana li hemberê hêz û şexsiyetên welatperwer çıqas suç kirin jî rojekê lebihurtin ne xwestin. Ji ber ku çendî me behnfirehî kir û me nexwest dijmin bi me bikene jî, lê dîsa jî guhertinek di wan de çê nebû. Ji sebra me cesaret girtin û roj bi roj ji ber bêdengiya me hêz girtin û erîşê xwe berfireh kirin. Yanî dixwazin li welatê me yek kesê me mejû azad nemîne.

Ez ji kesên dilrehm, dilovan û bi wîcdan dipirsim: Ma gelo kesên hindik hestên welatperwerî û mirovatî pêre hebe, wisa dike? Di jîyana 36 salên derbederya min de, ya rast, dijmin jî ev tişt bi me nekiriye.

Ji xwe qasî hatiye têgihiştin, zîhniyet û mentalîta wan eve: Li ser bandorê deyne, çavsoriyê bike, bitirsîne, bêbextiyê lê bike, îrade û heş teslim bigire, bike kole û bi kar bîne.

Min ji rastiya xwe tu car dev bernedaye. Min rastiya xwe herdem di stranên xwe de aniye ziman. Haji xwe bû me, hezkirin û evîna gel û welatê min di xwîna min de cîh girtîye. Lê li gor uslûba tevger, têkilî û rewşa mirovatiyê mirov silava xwedê digre û dide. Merheba dibêjê û rêzdar dibe. Mêvandarî kevneşopîya resena me Kurda ye. Em jî li gor xwe dibînin ku çi raste çi xirabe. Heke mirov bi xwe û armanca xwe baver be, carna pêwist be dikare li gel dijminê xwe jî danişe, behsa rastiya xwe û gelê xwe bike û biparêze.

Ma xelk nizane ku Şivan Perwer li hemberê zilm û zordarî tu car stoyê xwe xwar nekiriye. Ma hûn jî nizanin ku ti kes nikare bayê hunera azadiyê ji ser welatê min rawestîne û lorîkê min ji dil û mejîyê gelê min derîne? Ma hûn nizanin ku rejîmên faşist û koledar ji ber rastiya hunerê min çikas Kurd girtin, işkence kirin, kuştin, yan bi dar xistin? Lê dîsa jî nikaribûn bayê hunerê min rawestînin.

Banga we dikim: Baş bizanibin ku ez Şivan Perwer im. Yanî hevalê bargiranim, ruhê Kurdistan, bê rawestan kurê gelê xwe me û wêrek û bi bawerî me. Kesên paqiş û bi bawer ji qirêjiya bêbexta natirse.

Ez we dispêrim ûcdan, rehm, dilovanî û raya giştî ya gelê Kurd û Kurdistan.

Dîsa baş bizanibin ku gelê me û dîrok dê çi car bi vî awayî li wan nebihure.

Slav û Rêz<br>
Şivan Perwer<br>
13.02.2010


# Mirina Rojê, Mahmûd Baksî

**Arşevê Oskan**

*Nema dikarim veşêrim*<br>
*durûtiya hemdem*<br>
*di pêvajoya temenê xwe de*<br>
*Kêlîk bi kêlîk*<br>
*nêzîkî mirinê dibim*<br>
*nêzîkî jiyanek nû dibim*<br>
*her tiştî ji demê re bihêlim*<br>
*Bi nav nîşan nakim*<br>
*Diyarî pêşerojê bikim û*<br>
*bihûnim*<br>
*mîna pêteke agirê vejînê*<br>
*di dilê min de gur dibe*<br>
*Çavên bendewar*<br>
*mîna bizotê dibêje:*<br>
*Ez ê herim Amedê mîna*<br>
*quling*<br>
*Çi kes nikare baskên min*<br>
*bişkîne*<br>
*De bila Evdalê Zeynikê*<br>
*li ser qulingê baskşikestî*<br>
*bes stranan bixwîne, bihûne*<br>
*Kî dikare rastiyên şevan*<br>
*bihûne ?*<br>
*Kî dikare kuştiyên rêçan*<br>
*bijmêrin ?*<br>
*Kî dikare min û Beko li hev*<br>
*bîne?*<br>
*Belê ..*<br>
*Destarê derdan*<br>
*ev sî sal dilê min dihêre*<br>
*bê rawestan zîz dibe û difikîne*<br>
*bêyî ku rojekê ji min fedî bike*<br>
*Di tariya şevan de jî*<br>
*li tariyê, li dûriyê*<br>
*kûçikên har min dişopînin*<br>
*Çi dixwazin?*<br>
*Çend helwest pêk anîn ?*<br>
*Mala wan ava be*<br>
*Ez hogirî dozê kirin ji zarokatî*<br>
*Tovê hezkirina axê*<br>
*di dilê min de çandin*<br>
*Gur kirin agirê dilê min*<br>
*Bi nezanî*<br>
*ez û evîn li hev banandin*<br>
*ez û xwe ji hev qetandin*<br>
*De werin em çekan bikar bînin*<br>
*Ji we re strana Bavê Fexriya*<br>
*di guhê dîrokê de bistrêm*<br>
*heyanî rojên serfiraziyê*<br>
*da bi dilekî şikestî koç nekim*

(Ev helbest di derbarê koçkirina Mahmûd Baksî de hatiye nivîsandin)

**ji pirtûka (XEWNISTAN)**



www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com





## Îranê lêborîn ji Îspaniyayê xwast




Elî Ekber Salihî, Wezîrê derve yê Komara Îslamî di pêwendiyek telefonî de ligel Wezîra derve ya Îspaniyayê seba destbiserkirina serkunsolê Îspaniyayê di nerazîbûnên roja 14' Şibatê, 25'ê Rêbendanê, daxwaza lêborînê kir û dan bi wê yekê danî ku ew karê wan şaş bûye.

Herweha Tirînîdad Cîmz, Wezîra Karê Derve ya Îspaniyayê ew yek piştrast kir û got: Komara Îslamî daxwaza lêborînê kiriye û gotiye ku bûyerek weha şaş, dubare nabe.

Hêjayî gotinê ye ku berpirsê kunsolxaneya Îspaniyayê roja 25'ê Rêbendanê ji aliyê hêzên ewlehî ên rejîmê ve bo midehê 4 seetan hatibû destbiserkirin û dewleta Îspanyayê jî ew kiryar bi micit wergirt û gef ji rejîma Îranê xwar, ger ku di demê 48 demjimêran de daxwaza lêborînê neke, ew dê nûneratiya xwe ji Îranê vekişînin.

## BDP:"Em ne mecbûr in ku hurmeta siyaseta Şivan Perwer bigrin"



Sîyasetmedarê BDP ê, Demirtaş, bersiva rojnamevanan li ser daxûyaniya Şivan Perwer da û got:

"Tu reaksîona me li hember Şivan Perwer re nîne. Ji ber ku ew hozanekî kurd e hurmeta me pê heye. Lê em ne mecbû rin ku hurmetê bi sîyaseta wî bigrin. Her kesên ku dixwaze, dikare piştgiriya polîtikaya vebûnê bike".

**Netewe**

## Li ser sunetkirina keçan fîlmek hat çêkirin



Ew fîlm ji senaryo û derhênana Nebez Ehmed e û li navçeyên Germiyanê wêneya wê hatine girtin û ji berhemên rêxistina Wadî ya Almanyayê ye û armanc jê hişyarkirina xelkê ye ji bo jinavbirina sunetkirina keçan.
Fîlm, li hola Geleriya Serdem li bajarê Hewlêrê bi amadebûna hejmarek ji çalakvanên rêxistinên civaka sivîl û nûnerên rêxistinên jinan hat pêşandan.
Piştî pêşandana fîlmê, gotûbêjeke dirêj û kûr derbarê naveroka fîlmê ji hêla temaşevanan ve hat kirin.
Derhêner Nebez Ehmed dibêje: "Fîlm, ronahî dixe ser sunetkirina keçan li Kurdistanê, niha jî kampanyayek berfireh li cîhanê tê meşandin ji bo qedexekirina wî karî."
Birêveberê Rêxistina Wadî ya Almanyayê li Herêma Kurdistanê, Felah Murad Xan daxuyand ku ew fîlm, berî çend salan bi teknîk û kelûpelên asayî hatiye berhemhênan wek xebatekê ji bo qedexekirina wî karê neşaristanî.

## Baştirîn xelata wêneya salê wergirt



Ev wêneyek e ji hovîtiya li Efxanistanê!

Ew wêneyê keçeke efxanî ye, ji ber meseleyên namûsê, bêvil û pozê wê ji aliyê malbata wê û Talîbanan ve hatibû birrîn. Wê demê temenê wê 12 sal bû.

Wêne ji aliyê wênegir ji başûrê Afrîqa, Jodi Bieber ve hatibû girtin.

Ji bo vê wêneya xwe Jodi Bieber, xelata baştirîn wêneya cîhanê "Wold Press Photo" wergirt.

Dema ku ev wêne cara yekemîn di berga kovara "Time"ê de roja 1'ê Tebaxa 2010'an hatibû weşandin, li seranserê cîhanê de deng vedabû.

## Her hefte 5 qalib sabûn dixwe



Tempestt Henderson 19 salî ye. Li Amerîka, Florida dijî.
Her hefte 5 qalib sabûn û dermanê kincan dixwe.
Doktor dibêjin, eger ew dev ji vê yekê bernede, ew riya mirinê li pêşiya xwe vedike.
Tempestt Henderson bi xwe xwendekara hemşîretiyê ye, dibêje ew nikare dest jê berde, Dibêje, wê carekê tiliya xwe xistiye nava dermanê kincan dîtiye ku tama wê xweş e, hem şêrîn bûye hem jî şor, xwariye û kêfa wê jêre hatiye.

Piştre carekê dema ku li serşokê de xwe şoştiye, kêfa wê ji kefa sabûnê re hatiye, zimanê xwe lêdaye, jêre xweş hatiye.
Ew niha, êdî weke xwarinê sabûnê dixwe.

**avestakurd**

## Di nav Kurdên diyasparayê de dawiya trajîdiyan nahê



Rojekê ji rojan her kurdekî li derve xwe wek balyozê gel û welatê xwe dihesiband û têhnî û birçî jî bimaya, kiryareke xirab nedikir.
Îro jî Ewropa tijî kurd bûye û bi zêdebûna wan re, trajêdî li aliyekê, rûreşî li aliyê din, sal bi sal zêde dibin.
Li gor raporta mîdyayê, kurdekî başûrî jina xwe ya îngilzî li bajarê Leicester yê li Înglistanê kiriye musilman, lê her tiştên nebûnî hanîne serê wê û carekê benzîn bi ser porê wê de rijandiye, gef jê xwariye ku wê bişewitîne. Li dawiya dawiyê, jina xwe û her du zaroyên xwe, dûre xwe jî kuşt.
Di binê raporta rojnameya îngilzî de nameyên tijî peyvên nerênî li hember biyaniyan hene. Di yekê ji wan de hatiye: Kengê jinên wek vê dê fêr bibin ku ji derveyê civat û çanda xwe nezewicin.

**avestakurd**

www.arsivakurdi.org